kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

HAVÎN/2008



38

# bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

**Utges av Apec-Förlag AB**

**Hejmar 38, havîn 2008**

**Ansvarig utgivare**
Ali Çiftçi

**Redaksiyon**
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

**Adress**
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
**Telefaks:** 0046-(0)8-761 24 90

**E-post**
info@birnebun.com

**Internet**
www.birnebun.com

**Têkilî/İlişki**
**Danimarka:** Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83
**Avusturya:** Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

**Belavkirin / Dağıtım**
Ewrupa**:** Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Türkiye/Ankara**:**
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

**İstanbul:** Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

**Biha/Fiyatı**
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

**Abone**
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

**İsveç hesap numarası**
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

**Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için**
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

**Çap / Baskı**
Apec-Tryck AB

**ISSN 1402-7488**




*Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.*
*Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.*

*Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.*

# NAVEROK / İÇİNDEKİLER




Wêneya li bergê pêşîn: Bekir Darı








**2** Mirin, kuştin, xwekuştin û windabûn... ***Ali Çiftçi***

**4** Li Berlînê Konferansa zimanê kurdî, ***Amed Tîgrîs***

**6** Kongreya Komela Încovê li Kopenhagê, ***Nebî Kesen***

**8** Çend gotin li ser cejna Newrozê, ***Jordan***

**9** Karsazên kurd li hev kirin...

**11** Here bira Nurî here, ***Nebî Kesen***

**12** Konferansa pêncemîn ya mamosteyên kurdî li Västeråsê pêk hat, ***Heder Diljen***

**13** Şeva di ber Danîşînê, ***Anton Çexov***

**18** Li ser cemedê jîyanek, ***Uskê Cimik***

**22** Gerila, ***Muzafer Ozgur***

**26** Henek, ***Mem Xelîkan***

**27** Kostek, ***Nuh Ateş***

**28** Netki, ***Seyfî Dogan***

**29** Bizin xurî, perê xwedîyê xwe xwar, ***Ahmed Gezer***

**31** Ziman û zîhnîyet, ***Nuh Ateş***

**36** Çem, ***Seyfî Dogan***

**37** Hêvîdar be!, ***Mem Xelîkan***

**38** İçtoroslar`dan bir dewlet adamı ve şair: Kenan Paşa, ***Mehmet Bayrak***

**42** İslam Öncesi Kürt Şiirinde Yaresan:Aleviliği, ***Mehmet Bayrak***

**53** Peymana mafê telîfê -copyright-








# Mirin, kuştin, xwekuştin û windabûn...

Dijwariyên li welêt di pir aliyên civakî de her ku diçe dijwartir dibe. Ev hukumeta ku bi piraniya dengdêrên Anatoliyê hat hilbijartin, ew hêviyên ku dabû xelkê, çi ji aliyê aborî û çi ji aliyê mafên kurdan de be, yek soza xwe jî bi cîh neanî.

Gotin; em ê ji mafê kurdan yê kulturî re îmkanan peyda bikin, di dewsa wê de ji ber ku Newroza 2008an li Qonyê pîroz kirin, bi dehan kesên kurd hatin zîndankirin. Di şerê li Kurdistanê de dîsan ji gundên kurdên Anatoliyê re hem cenazeyên eskeran (ji gundê Kutiga re) û hem jî cenazeyên gerîlayan (ji gundê Încovê re) hatin.

Gotin; em demoqrasiyê ji fikra azad re tînin; însanên me yên kurd bo dîtinên xwe ku di hinek malperên kurdan de hatine belavkirin, hatin binçavkirin. Ji wan yek ku bi xwe hemwalatiyê Swêdê ye, birêz Hesenê Alê, ji ber nivisên wi yên di malperan de, di derbarê mesela kurd û Kurdistanê de belav bûne, şeş meh ceza lê hatiye birîn.

Bi van hemû kirinên hukumetê, dewleta Tirka dixweze dîsan çavtirsiyekê di nav xelkê me de belav bike daku ji mesela xwe bi dûr kevin û di prosesa asîmilekirinê de di wexteka nêz de ji holê rabike.

Em pir bi rêhetî, di van salên dawi de di her aliyê civata me de vê rastiyê dibînin. Însanên me dîsan wek salên 60î û 70î ji kurdbûnê direvin û ber bi tirkçîtiyê ve terin. Bo nimûne, binêrin bi dehan, li welatên Ewropayê komelên li ser navê gundan têne avakirin. Giştik jî, navê xwe siftê bi zimanê tirkî lêdikin. Destûrên xwe bi zimanê tirkî dinivisînin. Di komelên xwe de jî bi zimanê tirkî deng dikin.

*

Mirin hertim serêşîyek e ku ji canê me, ji hezkirên derûdora me, ji însanên ku ketine dilên me, ji nav me hildaye û biriye. Mirin ji ku da tê, ji bo çi tê, bila bê, hertim xebera hatina mirinê ne xweş e. Mirin mala meriyan vala dike, dost û hezkirên meriyan ji meriyan distine û bi xwe re dilêşeka mezin tîne. Ji ber wê jî tu kes ji mirinê hez nake. Mirin tiştekî xembar û bi êş e! Mirin bi xwe namire, lê mixabin hertim bi me ra dijî!

Malxiraba mirinê, pir însanên ku me ji wan hez dikir, di van salên dawî de ji nav me yeko yek hilgirt û bir! Ji wê kerwana mirinê îcar jî hezkirekî me yî hêja, dostê xizanan, gula Anatoliyê, hêviya gel û welatperwerê bêhempa Nurî Ozdemir ji nav me kijand û bir!...

Nurî Ozdemir ji Încovê navek bû!.. ji aliyê pir însanan ve dihat bilêvkirin, dihat naskirin heta roja dawî tu kesî xirabiyeke ji wî neditiye, dilê tu însanekî neêşandiye. Te ji kê pirs bikira ê gotinên

xweş ji bo Nuri bigota. Hinek însan hene bi gotina xelkê zû ji nav me bar dikin û diçin!.. Nurî, tu jî yek ji wan însanan bû ku te pir zû ji nav me bar kir û tu çûyî!.. Însanên me dê bi te serbilind bin! Em dizanin ciyê te dê demek durûdirêj neyê tijîkirin. Încov ê bê te xwe sêwî bibîne!

Birayê Nuri, em van gotinana ne ku wek edet li piştmirina te dibêjin, na! Em dizanin û xelkê Încovê jî dizanin ku gotin ji bo însanetiya te têrê nakin! Tu di gora xwe de rihet be! Xelkê Încovê dê xwedî li te derkeve. Dê navê te li ser kolanên Încovê bêt nivisandin, tu dê her di dil û hişê me da bî!...

Bila serê herdu kurên wî, malbata wî sax be, ciyê wî buhuşt be!

*

Û ev xebereke reş û ne xweş bû ku xwendevanên Bîrnebûnê di vê hejmarê de dixwînin. Lê di vê hejmara me de xeberên xweş jî hene: Karsazên kurd li Danmarkayê hatin cem hev, li Berlînê konferanseke li ser ziman li dar ket, Kongreya komela Încovîyan li Kopenhagê çêbûye, mamostên zimanê kurdî ji her çaraliyên Kurdistanê li Swêdê, li bajarê Västeråsê civîyan. Ji bilî van xeberên xweş û ne xweş, wergereka kurteçîrokek Anton Çexov jî heye ku Mem Xelikan bi zar û kurmancîya Anatoliya navîn wergerandîye. Me got, edebîyat... Ûskê Cimik, Ahmed Gezer û Muzafer Ozgur heryekî bi çîrokek xwe, Seyfî Dogan û Mem Xelikan jî bi helbestên xwe yên edebî rûpelên vê hejmarê xemilandine.



Nurî Ozdemir (1961-2008)

Û ev hejmar ji henekên Meme Xelikan (nivîs bi navê henek in) û herweha Nûh Ateş bi nivîseka xwe ya balkêş: *"Ziman û zîhnîyet"* bala xwendevanan dikêşe ser zîhnîyeta tirk û zimanê kurdî.

Di beşê tirkî de birêz Mehmet Bayrak dîsa du nivîsên xwe yên hêja û balkêş bi zimanê tirkî di kovarê de raxistîye: *"İçtoroslar dan bir devlet adamı ve şair: Kenan Paşa"* û *"İslam Öncesi Kürt Şiirinde Yaresan-Aleviliği"* du lêkolînên wêjeyî yên dîrokî nivisîye.

Ji ber girîngî û pêdiviyeke wê ya di pêşerojê de, em bi sernivîsa *Peymanên bingehîn*, peymanên weşangerîyê ji bo we xwendevanên birêz di vê hejmarê de diweşînin. Ev kar û xebat ji aliyê redeksîyona Weşanxaneya APECê ve hatiye amadekirin.

Bi hêvîya havîneke germ û xweş, heta hejmarek din, di xêr û xweşîyê de bimînin.

**Ali Çiftçi**

# Li Berlînê Konferansa zimanê kurdî




Konferansa zimanê kurdî li Berlinê — Foto: Şîrin Amedî

Li Berlînê Konferansa zimanê kurdî hat li darxistin.

KNK û Enstitûya Kurdiya li Elmanyayê di roja zimanê kurdî de (14-15ê gulanê) li paytextê Elmanyayê, li Berlînê Konferansa zimanê kurdî li dar xistin. Ji Bakur û Başûrê Kurdistanê û ji gelek welatên Ewropayê nivîskar, hunermend û rewşenbîr beşdarî konferansê bûn. Naveroka konferansê gelek dewlemend bû lê pirhejmariya mijaran û kurtbûna demê bala mirov dikşand ku mirov nikaribûn bi hûr û kûr biaxivin û mijaran gotûbej bikin. Renginî dewlemendiya konferansê beşdarbûna kesên xwedî bîrûbaweriyên cuda bû. Li gor bernameyê mijar û kesên axêver weha hatibûn rêz kirin:

Roja14ê gulanê

Pêşî konferans ji aliyê Mîrhem Egîd ve hat vekirin û piştre berpirsê komîsyona ziman a KNK Rojan Hazim û serokê Enstîtûya Elmanyayê Fehmî balayî axafîn. Samî Tan li Bakur rewşa weşanên kurdî, Dr. Kamuran Berwarî li Başûr

rewşa masmediya kurmancî, Dr. Fazil Esmer, li başûr edebiyat, Behroz Sûcaî ziman û nasyonalîzm, Kakşar Oramar li Rojhilat rewşa axaftin û nivîsînê, Mustafa Reşîd di warê axaftina rewşa kurmancî de li Rojavayê Biçûk, Şoreş Reşî di warê axaftin û nivîsînê de rewşa kurmancî li Anatoliya navîn.

**Roja 15ê gulanê**

Husên Xaliqî li Rojhilat bi soranî rewşa perwerdeyê û xwendinê, Dr. Azad Berwarî rola zaravayan, Dr. Zerar Sadiq Tofîq dîroka nivîsandina soranî, prof. Dr. Wurya Emer Emîn standartkirina zimanê kurdî li Başûr (ew ne beşdar bû lê nivîsa wê hat xwendin.) Lerzan Jandil di warê perwerdê de li Bakur rewşa zaravayê zazakî, Amed Tîgrîs di kurmancî de rewşa pirtûk û materyalên perwerdê, Aleedîn Aktaş li bakur û metropolên Tirkiyê di perwerdeyiya kurdî de berpirsiyariya malbatan, Fewzî Ozmen li Ewropayê di warê perwerdeyê de rewşa dem û dezgehan, Dr. Evdilwehab Xalid Mûsa li Başûr pirsa du alfabeyan, Mueyîd Teyîb li Başûr rewşa perwerdeya sereta û navîn, Dr. Nazenîn Celal Muhemed li Başûr rewşa kurdî li zanîngehan.

Konferansê di dawî de mafê axaftinê da Dr. Ibrahîm Zaxoyî, M. Nazîf Mayî û Elî Çiftcî jî. Elî Çîftçî behsa xebatên weşanxaneya APEC û kovara Bîrnebûnê kir. Li ser her mijarê gotûbêj û gengeşe hatin kirin û di dawî de li panelîstan plaket hatin belavkirin.

**Amed Tîgrîs**



Konferansa zimanê kurdî li Berlinê    Foto: Şîrin Amedî

# Kongreya Komela Încovê li Kopenhagê

Roja 27ê Nîsanê li bajarê Kopenhagê kongra ya „Komela Çandî û Alîkariya Încovê“ (Yeniceoba Kültür ve Dayanışma Derneği) ya çaran pêk hat. Nêzikî 60 endam di kongrayê de beşdar bûn. Ez jî, wek mêvan li wêr hatim dîyîn û min axaftinek kir. Ji bo min, beşdarbûna kongreyê firsendek bû ku xebatên komela Încowiyan ji nêzikî ve bibînim û çend tecrubeyan bigrim.

Kesên jî Încovê li Danîmarkayê berî çar salan hatine cem hev û komelek bi navê „Komela Çandî û Alîkariya Încovê“ saz kirine. Di hindurê komelê da jî fondeka bi navê „Fonda cenezeyên Încoviyan“ (Yeniceoba Cenaze Fonu) hatîye saz kirin. Di çar salan da 150 kes bûye endamê komelê. Endamên ku ji bo komelê aktîf xebatê dikin, gelek kêm in. Lê hinek sazgêr û xebatkarên komelê bê westan li ber xwe dane û hin jî xebatên hêja berdewam dikin. Hejmara endamên fondê jî gihîştîye 1700 kesî. Xebatên fondê baştir diçe û heta niha




Dîmenek ji Kongreya Komela Încovê




Dîmenek ji Kongreya Komela Încovê

bi destê Komîteya Rêvebir ya Fondê hatine berdewamkirin. Di kongreya çaran de fond bi temamî ji komelê hat qetandin. Ji virha komel û fond êdi bi hev ra ne girêdayî ne. Li gora berpirsên fondê, mimkûn e ku hîn 400-500 kesên din jî bibin endamê fondê.

Xûyaye ku malbatên ji Încovê li Danîmarkayê fondê hewce dibînin û dibin endam. Lê ji aliyê komelê teleb ewqas tûne. Pir kes naxwezin bibin endamê komelê û yan jî alîkariyên xebata komelê bikin. Di pîşt vê hewldanê de eşkereye ku tirs û dûrbûna ji sîyaset û tevgera kurd di nav Încowiyan da gelek mezin e. Divê rêvebir û xebatkarên komelê vê aspektê baş bizanin û li bersîv û çareyan bigerin. Ji bo pêşvebirina xebatên komelê pir giring e ku alakaya Încoviyan bi sîyaset û doza kurd ra pêk bê û di bin serbana komelê de jî aliyê armancên komelê wek „çandî" û „alîkarî" gavên nû bên avetin.

Xebat û hewldanên komelê bûyerên civakî ne û bê beşdarbûna civatê pêş va naçin. Civata Încoviyan li Danîmarkayê gelek pir e û ji bo xebatek civakî ya sîvîl potensîyeleka mezin e. Endamkirina 150 kes çiqes serkeftinek be jî, ne bes e. Di kongra çaremîn de kesên ciwan pir hindik beşdar bûbûn. Qet tûneyîna jinan kemasiyek din e ku rêxistinek

civakî ya sîvîl wek Komela Încowê tenê bi mêran pêş da naçe!..

Eger Komela Încovê xebatek baş bîne cîh, ew ê bibe nimûneyeka mezin ji komelên gundên din re jî. Bi navê wek Hecîlera, Kelhasan, Şereflî û Celîkan gelek komel û fondên Kurdên Anatoliyê lî Danîmarkayê hatine sazkirin. Sazbûna wan komelan ji hewcedariyekê tê û divê ji aliyê hemû kurdan ve alîkariyê bibîne. Wazifeya rêvebirên komeleyan ew e ku, di navbena komeleyan da têkilî û hevkariyê çêkin.

Perspektîf û armancên hemû komeleyan wek hev in yan jî ji hev ne dûr in. Ji bona vê, xebatên yekitiyên hemû komeleyan bibe armanca wan û herdem di rojevê da be. Kêmasiyek kongra komelê û fondê ew bû ku ji komelên gundên Anatoliyê û Tevgera Kurd qet mêvan beşdar nebûn. Çend komeleyên din yên gundên wek Hecîlera hatibûn dawetkirin. Lê berpirsên van komeleyan nehatin kongreyê û bersîvek jî ji bona dûrbûna xwe nedan. Divê Kurdên Anatoliyê û yên Kurdistanê alîkariya hemû komeleyên herêman bikin û dîtin û pêşnîyarên xwe bînin ziman. Nêzikbûna (entegrasyona) Kurdên li Danîmarkayê û li dewletên din yên Ewropayê bi vê awayî mimkûn û pêwist e.

# Çend gotin li ser cejna Newrozê

(roja nû, nûroj)

Wêk tê zanîn, di hundirê newrozê da 21 avdarê(adarê) 612 B.Z. pir tişt hene.

1- Xilasbûyîn (azadbûyîn)

2- Damizirandina împarotorîya Med(612 B.Z) û ev tarixa dibe destpêka salnameya kurd û hemû arîyan(*) (îranîyan).

3- Destpêka biharê

Ev salname û roja nû li gor haraketkirina royê(güneş takvimi) roj û sal hatîyê çêkirin. Salik 12 meh in. 6 mehên siftê 31 roj in: çileyê paşîn, sibat, adar, nîsan, gulan, hezîran. 5 mehên din 30 roj in: tîrmeh, tebax, îlon, çirî an jî teşrîn), a dawîyê yanî meha kanûnê (çileyê pêşîn) 29 roj in. Lê her 4 salan carekê meha kanûnê dibe 30 roj, yanî her 4 salan carekê rojek li salê zêdê dibe, ew jî tê dikeve meha kanûnê. Û ev sal dibe 366 roj.

Lê çi mixabin ku kurdên me yî tirkîyê û bi taybetî kurdên anatolîya navîn, sersala xiristîyanan an jî sersala eraban ji xwe ra saleke nû dibînin û li hev pîroz dikin.

**jordan**

(*)netewe kurd jî arî ye

# Karsazên kurd li hev kirin...

Dansk Kurdisk Arbejdsgiverforening DKAF(Komela karsazên kurd li Danmark) kongra xwe ya giştî ya avakirina komelê di 22ê nîsanê 2008an de, di salona Başakê li Kopenhagê çêkir. Komita avakirina komelê piştî xebateka întensiv ev hevîyên xwe yên ku wek karsazên kurd, li Danmarkê xwe bi rêxistînî bikin, bi cih anîn. Wek karsazên kurd yekemcara ku kurdên me li Danîmerkê xwe bi rêxistînî dikin, Di vî warî de karekî pîroz û dîrokî bi cih tînin.



Dîmenek ji Kongreya DKAFê

Di kongrê de ev kesên li jêr ji bo komîta karger hatin hilbijartin: Ertan Filikci, Osman Çiftçi, Mesut Yüksel, Çetin Genc, Erdal Karaca, Ahmet Biçen, Îbîş Taş, Mahmut Taşpinar û Mehmet Yücel. Wek cigir jî Süleyman Avci hat hilbijartin.

Piştî kongrê bi resepsiyoneka bi rêk û pêk, di eynê salonê de bi xwarin, vexwarin û bi gotarên mêwanan ve şênaviyeka xweş bi mêvan, endam û sponsorên xwe ve kongra xwe pîroz kirin.

Osman Baydemir, serokê şaredariya Diyarbekirê bi gotareka xwe tevli resepsiyonê bû. Osman Baydemir, di gotara xwe de kêfxwaşîya xwe bo kurdên li Danîmerkê yên ji Anatoliya navîn ani ziman û bi giranî li ser rewşa Diyarbekirê û karê xwe agahdariyên balkêş dan.

Resepsiyon bi beşdariya dengbêj Delil Dilanar bi klam û govendê dawî hat.

Ew kesên ku bixwazin bi DKAFê re bikevin têkiliyê, dikarin ji telefona li jêr re telefon bikin:

Tlf: 0045:43 64 04 02



Osman Baydemir di resepsiyonê de diaxife

# Li ser mirina Nurî Ozdemîr

Nebî Kesen



Rehmetî Nurî Ozdemir, derd û kulên hemû dost û hevalên xwe, weke derd û kulên xwe didît.

Hinek bûyer him ji bo kesan him jî ji bo civatekê yan jî gelekê pir giring û giran in. Mirina Nurî Ozdemir roja 2 Hezîran 2008 jî bûyerek wusa ye. Çima ku Nurî, bi şexsîyet û xebata xwe di nav kurdên Anatolîyê da cîhekî mezin girtî bû. Ew, heta roja mirina xwe bi nav û deng bû û wek nimûne ji bo bawerî û xebatên kesên sîyasî û welatparêz hat zanîn.

Nurî li gundî Încovê di sala 1961an da hate dinê. Heta roja mirinê jî li vir jîyana xwe berdewam kir. Zarokatîya wî bi dibistanê û cotkariyê derbas bû. Dawîya xelaskirina Lîse li Qonyê, bi malbata xwe ra dest bi xebata tîcarî kir. Ji gund zevicî û bavê du lawikan bû.

Nurî Ozdemir, bi nasname û xebatên xwe ji alîyê civakî û sîyasî him di nav kurdên Anatolîyê da, him jî di tevgere kurd da baş dihat zanîn. Wî di dema xortanîya xwe da dest bi sîyasetê kir. Dawîya salên 1970an da, Nurî, sempatîzanî DDKD bû. Wî kovar û pirtûkên li ser pirsgirêka kurd dixwandin û têkilîyên wî bi kurdên welatparêz û çep ra hebûn. Dema 12ê îlonî jî, Nurî bîr û bawerîya xwe bi tevgera kurd ra winda nekir. Di salên 1980an da bi kurdên Anatolîya ra di partîya SHP da aktîf bû. Sala 1994an dest ji SHP berda. Ji wur şûn da Nurî xebatên xwe di partîyên kurd wek DEP, HADEP, DEHAP û DTP da berdewam kir.

Mirina Nurî ne di şertên normal da pêk hat. Wî bi zanayî û bi destê xwe dest ji jîyanê berda. Çima wî va gava bi xof avet, mimkûn e qet nayê zanîn. Sedemên malî, şexsî û civakî bi hev ra girêdayî ne û bûne bingehê qerera xwekuştinê. Ji vê bûyerê, divê hemû kurd yên Nurî nas dikin li bersîvan bigerin û bibînin.

Kesên wek Nurî di nav kurdên Anatolîyê da pir kêm in. Wî bi salan ji bo nasname û mafên kurdan xebat kir, li ber xwe da. Di nav gelê Încovê û gundên dorê da Nurî wek nimûne ji bo kesên sîyasî û welatparêz cihekî hêja girt. Mixabin, me ew jî winda kir. Va windabûna ji tevgera kurd jî derbas dibe. Ji bona vê divê Nurî neyê jibîr kirin û ji alîyê hemû kurdan ve herdem bê bibîranîn.

# Here bira Nurî here

Here bira Nurî here
Rêya te rêyek dûr e
Dilê min qelîşand
Birîna vekirî pir kûr e

Te çikir nekir dizanî
Çare nedî, bê zimanî
Dîsa jî te pirskirîya
Ji wê rê êdi venagerî

Ez helîyam bi xeberê
Qebûl nakim qederê
Te em li paş cî hîştin
Çibk'm xwîn kederê

Tu kehil û zana bûy
Tu cemêr û heval bûy
Nakeve aqilê min, na
Ji bo xwe pir şaş bûy

Hîn sal hene li ber me
Hinek dert û serme
Divê em berxwebidin
Bo welatê dilê me

Here bira Nurî here
Lê çare ne li wir re
Sonda mezin ji te ra
Şûna te hîn li vir re

**Nebi Kesen**

# Konferansa pêncemîn ya mamosteyên kurdî li Västeråsê pêk hat



Pêncem Konferansa mamostayên kurdî ya Västerås bi coşeka germ dest pê kir û bi coşeka germtir teva bû. Di konferansê de li ser gelek pirsên ziman û perwerdeya kurdî nîqaş hatin kirin û biryar hatin girtin. Yek ji biryarên girîng hilbijartina kordînasyoneka ji bo mamosteyên kurmancî ye.

Mamosteyên ku beşdarê konferansê bûn ji her çar parçeyên Kurdistanê û Anatoliya navîn bûn ku li Swêd, Almanya û Norweçê bi awayekî fermî dersa kurdî didin.

Hin ajans û rojnameyên kurdî û swêdî yên digîtal û yên din bi awayekî gelek cidî li ser vê konferansê rawestiyan, nûçe û rapor weşandin.

Kî li ser çi axifî?

Di konferansê de babetên ku li ser hat axaftin û kesên ku semîner dan yan jî nîqaş bi rê ve birin ev bûn:

- Vekirin, ji Navenda duzimanî ya bajarê Vesterosê (Västerås): midûr Karin Brobäck
- Li Swêdê perwerdeya zimanê zikmakî: do, îro û sibe: ji Dayreya Giştî ya Pêşvebirina Xwendegehan (Myndigheten för Skolutveckling) mişawîr Mats Wennerholm.
- Îmkanên alîkar yên înternetê yên ji bo perwerdeya kurdî: Kemal Mavane.
- Zaravayên kurdî: kurdîya başûr (sorani) Aso Germiyani.
- Kurdîya bakur (kurmancî): Remzi Kerim
- Zazakî (dimilî, kirdkî, kirmanckî): Haydar Diljen
- Perwerdeya kurdî li Norweçê: Hatice Demirbaş û Zekeria Omer
- Perwerdeya kurdî li Almanyayê: Emîn Akbaş
- Îmkanên ji bo hevdîtina şagirdan ya li ser welatan re: Mia Lindh, och Haydar Diljen
- Nasandina materyalên dersê yên nû: Misto Brodrêj, Marûf Yilmaz, Emîn Akbaş û Haydar Diljen.
- Devoka behdînî Newzad Hirorî
- Laş û ragihandin Fadil Jaf
- Perwerdeya şagirdên xwedî astên cuda yên di heman grûbê de, Rewas Kader
- Di heman grûbê de perwerdeya şagirdên ji perçeyên Kurdistanê yên cihê- minaqeşe: rêvebir Tahsin Aslan
- Temaya zimanê zikmakî/Fêrgeyî zimanî kurdî, Serko Amîn
- Temaya zimanê zikmakî/Dibistana kurdî, H. Diljen
- Baştirkirina peywendîyên di navbera mamosteyên kurdî de, minaqeşe: rêvebir Serko Amin



Hatice Demirbaş û Zekeria Omer

Hema hema hemû babetên konferansê bi awayekî gelek bi rêkûpêk hatin pêşkêşkirin û nîqaşkirin. Ez bawer im, kurdên soran cara yekem kurdeka ji Anatolîya Navîn, ku bi devoka xwe peyivî guhdar kir û sempatîyek gelek germ jê re nîşan dan. Zaravayên kurdî, îmkanên guhertina şagirdan ya li ser sînoran re û projeya Amedê, devoka behdînî jî ji wan babetên ku herî pir bal kişandin bûn.

12-05-2008

Haydar Diljen(Rêvebirê konferansê û redaktorê Dibistana Kurdî)

Ji bo zêde agahdarî di derbarê konferensê de li malpera www.dibistanakurdi.com ê binêre.

# ŞEVA Dİ BER DANİŞÎNÊ *

**Anton Çexov**

Yê erebe diajot, çerx bû li min mês kir. Bi qamçiya xwe, kêrguyê bi lez di ber me re derbasbûyî mêrand; ” Nîşana xirabiyê , Begî mino” got.

Îblîs tev li kar nebe jî, ku pêşeroja min nehêvîdare min dizanî. Çimkî, bi du jinan re zewicî wûm. Ji bo sendelya bersûc (sanık) rûnime, ya herema dadgeha S. , li rê wûm. Hewake berbad. weng şil, qefilî, li lerizîna erebê weng gêj bûme ku, bi nîvê şevê dema ez gêhiştim Xana Menzîlê, ez ji jor da hetanî jêr bin berfê ve, şilbûyî û wek selexanekî ( salak) xweş ço kirî wûm.

Li Xana Menzîlê, yekî bi derpakî bi şivên şîn, serkeçel, ji çavan de xew diherike, wek serpene (sırık) pêşwazîya min kir. Simêlên mêrik, ra di bivîlan re dipişiqîn. Bîhnheynana vî, dixwaze bi qar bûya. Di Xanê de tu bîhna xweş jî tunewûn. Serkarê (değnekçi) Menzîlê humehum, bi of û puf, stuyê xwe di bin yaxa xwe re xurand, dema derîyê "cihê xanî yê raketinê" ji hev kir, bîhna mûmê mohrê û bîhna bezmikên (tahtakurusu) perçiqî tevlihev bûn û hewayeke tirş kete pozê min. Hendik ma ez bifetisim. Lambeke ji tenekê ku dîwarên ji textên bêboyax ronî dike li ser masê, li doralîyên xwe wek çira darê qaşê (çam) dorinc (is) belav dikir.

Dema ketim hundir, min bawilê xwe da ser masê ”Of, çi bîhneke nexwaş ji vir têye senyor” min got.

Serkar hewa bîhn kir, wek bi gotina min bawerîya xwe nîna, serê xwe li ba kir. Gepira xwe xurand, ”Na canim, bîhna her ro ye.” got. ” Ji bo tu, ji ber sermayê ketî germîyê bi te weng hat. Erebevan, li cem hespên xwe gewer (zibarmak) dibin. Begên li vir radikevin jî, nexwaş bîhn nadin.”

Min serkar ji derê xwe kir dûva, demeke qut be jî min, cihê ez rakevim berçavan re derbas kir. Dîwana ez li ser rakevim, bi qasî qaryoleke ji du meriyan re wû. Mişembe di ser re kiriwûn, wek cemedê sar wû. Di hodê de ji xeyrî dîwanê, zobeke ji hesin û mezin, maseya gava din min qal kirî, kes nizane ji kê de mane; çizmene ji kulav, turikekî bi çûk û perewaneke ku hodê bi du ciya dike hewû. Li paş perewanê yek, xweş xweş di xewê de wû. Min, hode weng di ber çavan re derbas kir şuva, mitêl li ser dîwanê raxist û dest bi xwe tazî

kirinê kir. Li wê navberê, pozê min huyî bîhna hodê bûbû. Bi tûldan û pekînê, bi ken min çeketê xwe, şalê xwe û çizmên xwe, ji xwe kirin. Pêxas mam şuva, hê qurçimî doralîye zoba hesin re çend caran pekîm. Weng tûldan û pekîn, hindik be jî, ez tenakê germ kirim. Niha şuva, ser dîwanê xwe dirêj kirin û ketina xeveke xweş mawû. Lê li wê demê bûyarek biçûk hate serê min. Çavên min, bi nexwazî li paş perwanê ketin. Tirsa wîngê, ketî dilê min ez nikarim kat kim!

Li paş perwanê; jineke porgij, çavreş, diranên xwe giştikan dimêrîne û çîqkirî hewû. Bi ser de jî, li min mês dikir. Birûyên wê yên reş ku dileqîn û li gepên wê yên kortbûyî te mês kir, tu yê bêyî qey dikene. Ji fedîya re, min nizanî ez çi bikim... Wexta fehm kir min ew dît, jinikê jî fedî kir, serê xwe veşart. Min, çavên xwe wek yekî bi sûc daynan ber xwe. Nêzikî dîwanê bûm, min serê xwe kire bin seqoyê xwe û ez raketim. Min, wek; ”rewşake pirr neçê ye ”fikirî.” dixwaze, pekîna min dîti we! min qet baş nekir...”

Min ew qermûçikên li van rûya nedîtin, di serê xwe de dan jiyan û ez ketim xem û xeyalên şêrîn. Yekcar, dîmenên pirr rind hatin ber çavên min... û tu yê bêyî, qey ez guneyên fikirên xwe dikşînime di gepa xwe ya rastê de min, janeke giran û dişewitîne bihîst. Min, gepa xwe girt lê tiştek bi dest xwe nexist. Bi wê re min, hema rewş fehm kir. Bîhna neçê ya bezmikên perçiqandî hate pozê min.

Di wê navberê de dengê jineke ku gotî” va çi ye?” min bihîst. ” Bezmikek mendebûr no, armanca van dixwazin min bixwin û teva kin”. got. Bi carekê re kete bîra min, ez, her bi rê ketim, edeteke min hewû min dermanê kêçan bi xwe re digerand. Li wê rêvitîyê jî, ez girêdayîyê wê edeta xwe wûm. Min dermanê kêça heyna wû. Koda min, dermanê kêça kirîyî min hema ji çentê xwe biderxist. Niha dûva dermanê parezîtan diyarî xwedîya wî rûyê rind kirin maybû. Dûva, dostanî di çente de kewek wû. Lê çing pêşkeş kim?

” Of, tiştekî hovitî ye”. Bi ser wê qîrina jinikê we, hetanî ji dest min ve hati ye bi dengekî şêrîn ” Xanin efendi” min got, ”Kasî min fehm kir, bezmik te jî aciz dikin. Bi min re, dermanê keça heye, ger tu dixwazî...”

”A, tu yê keremkî !”

”Wengê niha” min bi xenê bûyin pisikand.

”Bi destûra te, ez seqoyê xwe li xwe kim a niha tînim” .

”Na na... di ser perwanê re bide, nekeve vira!”

”Zati ez jî, di ser perwanê re bidime.”

”Te, ez yekî bê hurmetîyê bike zanim?”

”Çi dizanim? di vir re her cins meri derbas dibin.”

”Eman tu jî! ku werim cem te çi dibe? Di vê de tiştek tune ku!.. Ez toxtor im.” wîngê min dereweke xwe ya wenk çêkir.

”toxtor, mensûbên ewlekarîyê, Berber dikevin jiyana meri ya teybetî jî”

”Bi rastî, tu toxtor î? Tu bi rastî dibêjî?”

”Ciddi me. Bi vê rewşê, ji derman anînê re destûr heye?”

”Ê, madem toxtor î erê... Lê çima zehmet bikî? Ez ê mêrê xwe ji te re bişînim.”

Dengê xwe kêm kir, ”Fedya” got.” şiyar be, meriyê şişko û tombulo, rabe ji kerema xwe re here perê wî alî perwanê! Toxtorî vikasî nazike ku dermanê kêça kerem dike ji me re.”

” Wexta ku min êvisî, mêrê wê jî li cem wê ye hişên min ser û bin bûn. Wek min, ji serê xwe de ço xwaribe. Nêçirvanekî dema, tetigê tifinga xwe bikişîne û tifing agir neke jî herhal, hisên mine wê demê ê bijiyana. Him fedî kirin, him bi xwe û xwe êşîyan, Him jî xemgînîyeke mezin... Min xwe vikas neçê his kir, mêrik bi min wekî yekî vikas berjêr xuya kir ku tu nema ez bêm ” min xilas kin” Mêrikê jinikê, yekî jar, bejndirêj û nêzikî pênce salîya xwe hebû. Lêvên xwe ,wek yên memûra guvaştibûn. Di pozê wî de tamarên tevlihev bi ber çavan diketin. Sûret û gepên wî spî bûbûn. Li ser wî pîjama û lingan de şimik hebûn.”

Wexta dermanê kêçan ji dest min girt” tu, pirr nazikî toxtor” got. ” Spas... çinge, tu jî bi ber dupîye ketî?”

Min, hema bi hêrs seqo kişande serê xwe û got ”erê”

” Na lo, wex wex”

Vegerîyabû cem jina xwe.

”Zînoçka, li ser pozê te bezmikek heye çi?” ew gotina min bihîst.” Destûr bide ez wê bigirim.”

”Hema bigire! Te negirt? Tû ji te re, Tu memûrekî devletê yî duwemînî mezinî, herkes ji te ditirse, tu ji heqe bezmikekê nehatê derê!”

”Zînoçka... Li cem kesên yad vana tên gotinê?” kesera xwe kişand ” tu tim weng î, zati...”

Bi çi xûli bûm, min bi xwe jî bi nezanîn ”Kor bûno! nakine xewê !” min pisikand.

Pirr derbas nebû, dengên jin û mêrê wê hate birînê. Min jî, ji bo xewa xwe belav nekim, tiştekî nefikirînê şuxulîm. Lê navberê de nîv, an jî saetek derbas bûbû, ez hê neketibûm xewê. Li vê navberê, cîranên min jî geh virde geh wêde çerx dibûn û bi pistepist dest bi xeravîya kiriwûn.

Min gotina fedya, ya gotî ” Çi tiştekî şaş bikî, dermanê kêçan jî fêde nekir” bihîst.

”Çi pirr bûne, van mendebûrana. Toxtor! Zînoçka, dixwaze tiştekî ji te pirs bike. Eceb ev bezmikana çima veng neçê bîhn didine?”

Me dest bi dengkirinê kir. Me qala, tipa ku ez qet jê fehm nakim, ya bezmikan û ya Edîson kir.

”Zînoçka, çima dikevî tengasîyê? Toxtor wûye... Ji fedîkirinê re gereg heye? De pirsa xwe bike... ji vê tiştekî newêrî tuneye ku. Profesor Şvertsov, tu fêda xwe newû, belkî va toxtora tiştekî bike”

”Bi xwe pirske”

Paşê, Fedya banga min kir: ”Toxtor beg, di sînga jina min de guvaştin heye. Ku dikuxe, çawa bêjim, bi qar nefesê heydine. Tu ê bêy, qey tiştek bi wirda nusikî ye.”

Min bersîveke bi zexelî dayê.

”Va mijara pirr dirêj e. Katkirina wê ê pirr wextê bixaze.”

”Dirêj be, çi diwe? Çing heye em ranakevine, gelek wextê me heye, wê muayane bike ji kerema xwe re hosteyê min. Ha, ez wê jî bêm, di ber wê Şvertsov êpî eleqedar bû, mês kir... meriyekî baş e, Çi dizanim? Lê bawerîya min bi wî tune. Bawer nakime... Dîsa jî ji te pirr rica dikime. Hetanî tu jina min muayane dikî, ez herim ji serkarê Xanê re bêjim ji me re semewarek çay bikelîne.”

Fedya bi şepeşepa şimikan ve bi derê derva ket. Ez jî ketim paş perwanê. Zînoçka, li ser dîwaneke fere, xwe bi balîfan helpisartî rûniştî, bi destekî xwe jî, ji bo yaxa pîjamayê xwe bi hev de dişuxulî.

Ez nêzikî bûm û min rûyê xwe ciddi kir.

”Zimanê xwe dirêj ke, ez mês kim.”

Zînoçka wexta zimanê xwe mêrand kenîya. Wek yê herkesekî normal, zimanekî wê yî sor hewû. Min xwast nabiza wê bigirim.

Min got: ”Him!” min, nabiza wê nedîwû jî.

Dema min rûyê wê yî dikenî û biçûk mês dikir, hê min çi pirs kirin naye bîra min. Lê dû muayenê ve ez vikas sersem bûyî wûm, halî min î ku ez pirsekê bikim nemawû.

Dûva em hersê li doralîyê semawarê rûniştin. Dema em ê dest bi çay vexwarini bikin, dixwaze ez reçetekê binivsînim hate bîra min. Min jî girt, wek qaîdên ilmê tipê reçeteyek nivisand.

Reçete : Ji bo Xanim Sîyalova

Sic transît* 0,05

Glorîa mundî** 1,05

Aqua destîlatae*** 0,11

ji du saeta carekê, kevçiyekî şorbê.

Toxtor Zaytsev

( * , ** ” ya veng derbas be şohreta dinê.” *** ” Ava paqiş, sterîl”)

Dora dine royê, çentê min î rêwitîyê

dest min de, ji dostên xwe yên nû, ku careke din em hev û du nebînin veqetînê re, min xwe amade dikir. Fedya rahiştiye pişkoja çaketê min, dixwaze 10 Ruble pere bide min.

”Na, dixwaze tu bedela vîzita xwe bigirî. Vezîfeke bi duristi hatî kirinê, bedela wê dayîn, deynê stuyê min e. Te li dibistanan henişk pûç kirin. Vikas ceribandin te êvisîn. Zanyarîya te bi dest xistî bihayê xwe, xuh û xwîn e. Ez wana dizanim.”

Çi bikî? Ez bixwazim jî - nexwazim jî min 10 Ruble girtin. Şeva di ber danişînê veng derbas bû.

Dema ku derîyê salona danişînê ji hev bû û mubaşîr sendelya bersûc bi min nîşan da, hîsên min jiyayî dirêj dirêj kat nekime. Lê ez vê bêjim; dema paş xwe vegerîm, bi hezaran çavên çerxê min bûyî min dîtin. Ne bi dest min ez zer bûm, Min aciziyek mezin hîs kir. Min li rûyên endamên jûrîyên bi azamet û ciddi mês kir, xuha seklanê li min ket.

Dema çavên min, li masa savcîyê rûniştî û bi çuxê sor nixumandî ket, tirsa dilê xwe katkirinê, ne gûca min digê ne jî hûn dereceya tirsa min xeyal dikin!.. Ez li wir kê bibînim hûn ê pê qaîl bibin? Fedya! Va Fedyayê me... Wî hingê tiştek dinivisî. Dema min li wî mês dikir; bezmik, Zînoçka, muyena min kirî kete bîra min. Xuha sar vello kirin li wir daweste, ji pişta min de çiyayên cemedê ji jordan, berjêr diherikîn... Fedya dest ji nivisê berda şuva, serê xwe heyna li min mês kir. Siftê nas nekiriwû, lê dûva çav di serê wî de bel bûn, çenga wî ya jêr jê de dêwast, destên xwe cirifîn, paşê hêdî hêdî rabû, awirên xwe yên wek qurşînê berdan rûyê min. Nizanim ji bo çi, ez jî rabûm ser lingan û wek wî bixwim, min li hundirê çavên wî mês kir.

Serokê dadgahê ”Bersûc, navê xwe, paşnavê xwe bêje” got.

Savcî di cihê xwe de rûniştî û kupek av vexwar. Li enîya wî, dilopên xuhê berhev bûyî wûn.

Min: ”Herhal yê min tijî xwe bixaşîne” di hundirê xwe re derbas kir. Vikasî xuya dibû, savcî cezakî mezin ji bo min dê bixwaze. Bi hêrs îfadeyên delîlan tev didan, Li rast û çepên xwe xulî dibû û wû himehima wî.

Eh, nivisa xwe dixwaze ez li vir bi dawî bînim. Min wana di salona dadgehê de, wexta tatîla nîvro nivisandin. Pêçek şunda, savcî îddanameya xwe dê bixwîne. Çi dê bibe, wê wextê em ê biwînin.

Werger: MEM XELÎKAN

* Danişîn: Duruşma

# Li ser cemedê jîyanek

Uskê Cimik

**Televîsyon**

Şevêreş hedî hedî mîna çarşevekê xwe diavit ser gundî di kortê de. Gundekî nêzîkî ji çarsêd xanî bû. Hêlekê gund çarçîk, hêlekê xwe şorax, hêlekê xwe gola xwê bû, hêla din jî çend gundên Tirkan hebûn. Lambayên endîrkan yên di nav malan de hîn salek nebû hatibûn nav gund. Piranîyên malan bi "endîrk" bûn.

Havîna sala 1976an bû, li Xelikê Jêr, li malan bi qasî sê û çar televîzyon hebûn an nebûn, yek ji van jî Malê Kurda bû. Wê wextê, li gund sê televîzyonên bi nav û deng hebûn; Filipîs, Nordmende û Şaplores. Bermalîya Malê Kurda Agol bû, barên malê çi hebû gîşt li ser pişta wê bû. Mer û lawîkê xwe yê mezin li Alaman bûn. Merî wê hîng şeş meh berê hatibû îzîn e, û vi bi xwe re jî televîsyonek a bi navî 'Nordmende' anîbû. Televîsyon dihat nîvî bejna Agolê.

Wan salan ne kes li ber televîsyon nan dixwar, ne jî jinan derguşên xwe li ber wê dimijandin. Gundîyan ji Agolê re digotin, 'Agol Agol di van -yên di televîsyon de çing (çawa) têr dikî?'

Wê salê, her şev li Malê Kurdo jin, mer, xort, keç û kurik li serhev rûdiniştin. Rind te bîra min, ez hîng neh salî bûm, rokê min hesew kir, Agolê di şeveke de bîstçar gusîye bi run û bi şekirê hûr, danzdeh kulirê bi runê pez, pênç çaydank dayîbû mêvanan. Mêvanên malê jî hetek di televîsyon de bernameya "Gûne Bakiş" (Nêrîna Rojê / Roja Dawî) nedîtana nediçûn mal.

Cîranên Agolê ji malên xwe derketin, ew dihatin, yek bi yek diketin odê televîsyonê. Li ser sûkana (derence) biçûk solên reng bi reng li ser hevdû dibûn. Kûçikê malê Hec Mistefê jî ji dûr ve çav berdida merasan (solan). Mêvanên Malê Agolê ji 'Gûne bakiş' şûn de ew ê biçûna paş malê ji kortan solên xwe derbixistina.

Agolê bi kêyfekî û rukenî a bigota, 'maşallah maşallah çiqas mirov li gund hebûne.' Lê herik ro derbas dibûn, mêvan pir dibûn, Agolê dev li xwe xar dikir û digot, 'de bes e, va çi ye? Em di malkê xwe de qe xewekê nekin'

Xanîyê Agolê bi çar odan bûn, çatiyên xwe qemîş bûn. Televîsyon li "odê mêvanan„ bû. Hîn televîsyon

nehatî bû vê odê kesek ji mêvanan bêtir li odê ne rudinişt ne jî radiketin. Merê Agolê bigoto, „le le ez rêêê ji Alaman salê cike teme, ez û tu li odê nîvanan bi kêfekî raneketinî“.

Odê televîsyon biçûk bûbû lê kêm zêde bîst an jî sîh mirov têhaltat. Li arîkê hêlika derguşê b i du belên rêsinî va girêdayî bû, derguşa hîng bîst ro tê de bû, hêlik pêş de û paş de diheşîya, sîya wê ser yên li odê de runîştî re diçû û dihat. Li ber televîsyon kurik, dû wan keçik û xort paşê jin û dû wan jî du kalên rûsîpî Hesê Husînî Gemer, birayê Agolê Miçê Nurê û li cem wî jina xwe Fetê Husînî Gemer rudinîşt. Li kêlekê wê jî ez runiştim. Ji van mêvanan yên bi tirkî dizanîn li cem jinan rudiniştin, kalan jî dîzanî lê hinek ker bûn. Her yek jinê kurikek dida kêlekê xwe.

Roava bû, ji hêla gund de bayekî bê deng, şîrêgermî dihat, sîng yên şivanan dialastin. Di nav berê çar şivanan de arê vêdiketî har dibû, çîkên êr di nav êstirkan de vedilistin. Rûewro îro tijî estêrk bûn, ji kêfan yek bi yek xwe xuj dikirin. Hîva ku mîna keçikê rûgirover dibirigî dilê merîyan diketî. “Hur hura” şivanan mîna sîyên xwe dirêj carnan jî kurt dibûn. Rê li dû re arê şivanan ên vêdiketî mîna çîkekê ji gund ve xuy dikirin, sîyên şivanan li ser tûm yên rût re xiş dibûn, ew digehîştin pencereyên malan û dîlberên li ber penceran hembêz dikirin. Li ber ronîya lamban yên endirkan du sê çengên tijî vizik reqs digirtî yekî li yekê lênedigelibî. Li nav malan, di kuncikên tarî de ‘pistepista’ evîndaran, li paş malan jî ‘reperepê’ kirixan bûn. Li sîyên dîwaran jinên piştên xwe dayî di bervangên xwe de çîrokên dawî dadişandin.

Televîsyon li ser sindoqê bû, sindoqa cêzî mala bavanê Agolê a bûkînî bû. Li Xelika rokî berî bûkderxistinê sibe zû relê bûkê li derva, li ber malê dihat pêşandin e. Va sindoqê qehweyî, bi neqşên sor, zer û kesik di nav relê bûkê de yekanî bû. Bapîrê bavê Agolê ji Kurdistanê ji gundên der dorên Çiyayê Sipanê li hêştirê bar kiriye û ew anîye gund. Heta sala 1970î bazirganîya gund li ser pişta hêştiran bûbû. Bazirgannên gund diçûn Entebê, Meletî, Semsur, Urfê, Helebê û Wanê.

Mêvan li odê li peyhev ketibûn rêze. Li ser televîsyonê seatek biçûk hebû, wêneyekî mirîşkê tê de bû, mirişka sor serê xwe radikir, didanî, radikir û didanî û vê re jî dikir ‘tig tig tig’. Di odê de bi tenê dengê wê û televîsyonê hebû. Pisika malê jî xwe bi dîwêr de nûskan dibû, ew bostek ji sindoqê cêz dûr bû, pisika ku xwe topî serhevkirî

xwe gij dikir, ew hema hema li bazdanê bû.

Di televîsyonê de ‘turk fîlmî’ dilîst, ser milên Yilmaz Guney sakokekê reş hebû, şalgerdana sîpî jî li ser wî dihejîya, Fîlîsa kej û bijang dirêj li wî mez dikir û ew digîrî, vê re jî ji dûr ve dengê tembûrê dihat. Yên di odê de hen pê digîrin, henan jî pê dev lê jev dibûn, çend keçik û xort jî pê mest dibûn.

Derguşa di hêlke de girî, yên di odê de hemû bi hev ra bang dikirin, ‘Agol dengê wî bibirre’. Serê Agolê li ber da bû, ew di xevê de bû, serê wê lê dihejiya, bi dengên yên bangkirî ve bi hêrsekî rabû, vê re jî dikir “pilepil”, wê derguş ji hêlikê derxist û çû ew li oda din mijand. Di oda televîsyonê de, di kuncik de Hesê Gemer runiştîbû, li cem wî birayê Agolê Miçê Heme hebû. Hesê bi destekî xwe rihê xwe yê sîpî mist dida bi destê din jî moriyên tizbîyê dikişand, wî re jî li Miçê mez dikir, ‘te dî!!! Agolê ji çelî bişûnde derguşek çekir, hîng ewka wê dişîxuliye.’ Ew bi gotinên xwe dikenî, lê Miçê Heme di xeweke kûr de bû.

Derguşa Agolê hîn nehatibû dunê wê digot, ‘lawik bibe ez ê navî ‘Meg Milin’ bidim ser wî. (‘Mc Millen û Jina wî’ fîlmekî Emerikî bû) ‘Meg Milin’ berdilkê Agolê bû. Zayîna wê li Înevî ye (Cîhanbeylî) li nexweşxanê bû, hemşîrê ji Agolê re gotiye, ‘Êdî navî wî lawikê ‘Bulent’ e. Eger tu navî wî biguherî lawikê te bimire’. Agolê a her ro bigota, ‘orispî ji orîspîyê, navê “Bulend Ecevît” da ser lawikê min.

Yilmaz ketîbû nav deh û panzdeh merîyan, wî bi çekekî gîhşt mina kêrguhyên di nav tûman de xwe veşsartî yek bi yek li erdê dixist. Dengê “tak rake” yên çekan di odê de mîna brûskê vedida. Pisika malê jî bazdayî bû ser mişkê, ew di devê wê de diperpitî, pisika sîpî boç li xwe bel kir û bi rêveçûnekî serkeftinî ji odê derdiket, mînak tu bibêjî ew ji qada şer derdiket.

Yilmaz û Fîlîs li hevdû dinêrin, çavên wan lê dibirigî, li çavên wan tu qemîş nebî lê mez kî. Nêrinên wan pêçekê dom kir, pisika malê bi mişkê zik li xwe têr kir, Agolê derguşa xwe mijand, birayê Agolê xewê xwe yê du ro heyna, du se kurik ketin xewê, Hesê Qemer di ser nod û neh morîyên tizbîyê re du se caran çû hat, lê Yilmaz û Fîlîs hîn li hevdû dinerîn.

Yilmaz ji wê re got, ‘sevgîlîm! elînî elîme ver, kirlara gîdelîm’, û Feta Husinî Qedê bi lez berî xwe çexê min kir û bi dengekî girî got, ‘lo ez bi qurbanê te bibim, wî got çi?’ Dûva jî digot, ‘te dî!!! Yilmaz eynê mîna Hesmanê min e. Ez

bi qurban! simbêl çima weng lêten e.’

Feta Husinî Qedê gehiştîbû heftî, lê çavên wê hîng xort bûn, ew ê bi van salên xwe bi carekê re benî derzîyê di heft qulên derzîyan re derbaz bikira. Çermên rûyên wê mina xwelîya Xelika qelişîbû, çavên wê di bîreke kûr de bûn lê reşikên çavên wê hîn lêqeşûn. Jineke jîr bû, digotin ‘tu jin li ser Fetê re tûne ne.’ De tu were! Fetê sêrkirina televîsyonê pir hez dikir lê jê peyvek tirkî qet fêm nedikir, dîsa jî herşev dihat mala Agolê, ji şev de heta nivî şevê televîsyon sêr dikir. Çi gotin yên tirkî di televîsyonê de derbas bibûya yên li derdorê wê ji wê re ew werdigarandin kurdî. Fetê pirtir ji fîlmên diramatîk yên ‘turk fîlmî’ pir hez dikir û pê digirî, wê bi girî xwe dikuşt. Mêrê xwe Hesê Qemer jî wê salê e bi birayê Nurê ve bi ronîvro batiyana ‘olîmpîyata reqsa li ser cemedê’ sêr bikirina.

Ez ketim dest-lapên Fetê, ji wê xelas nedibûm, her şîva wergêrî Fetê bûm, min pir dixwest ku ez wergêrî Agolê bibim, ji ber ku ew her şîva li ber televîsyon diket xeweke kûr, herî ku ew diket xewê serê wê lê dihejîya û ‘kuuut’ li diwêr diket.

Min gotina Yilmaz Guney baş fêm kir lê de tu were! ‘sevgilim’ û ‘kırlara’ çi bûn? Min zik û gepira (stûker) xwe xurand û bel bel li darên arîkê mez dikir. Fetê bi enîşka xwe dîsa kutê min kir û ji min re got, ‘de bê! guhfîtko! Yilmoz got çi?’. Vê re jî bi destekî xwe serê min î rutik mist dida, minak tu bibêjî kevir û quçikên hûr li serê min dibarîn. ‘sevgilim’ û ‘kırlara’ çibûn. ‘Kirlara’ guhmedî! ‘sevgîlîm’ çibû?... Min va peyva qet ne li dibistanê, ne li mal û ne jî li gund nebihîstbû. Fetê ji mêrî xwe re digot, “Momo!”, Mom navê bavê Fetê bû. Mêrî Fetê jî ji wê re digot “keçê”. Ezê xizan ji Fetê re li ku ‘sevgîlîm’ bianîm.

Min bersiva Fetê da û ji wê re got, ‘Xaltî! Yilmaz Guney ji wê re got, ‘were xwestoka min! Destî xwe di destî min ke, em herîn sêz’ Fetê ew şorên min bihîst, lêva xwe dawîyê gez kir, destên xwe li jûnîyên xwe xistin û vê re jî dihêjiya, paşê li min mez kir, reşikên çavên wê hatîbûn vemirandin, dest li xwe sist kir û ‘şeplî’ li binguhê min da, gep li min bû xwîn û qîj qîja min dunê heyna bû...Vê re jî Fetê got, ‘eyîba giran e! Îşê (wan li sêz (kamîrî) çi ye?’

Nîvê şevê bû, bayê havînê dihat, zewî yên genim û ce di bin ronahiya hîvê û estirkan de minak tu bibêjî di deryakê şewîtî de pêl didan. “Hor hora” min jî li kulaxa deng vedida.

**Uske@kurdland.com**

# Gerila

**Muzafer Ozgur**

Li deşta Anatolîya Navîn havîn bû. Li gundê (C...) tîna ro (roj) herd diqevirand û kelakela germê li gund însan rivandibûn ber sîyên malan. Li nav gund însan, li ewran jî çûçik tunebûn. Jîyan ji bo germbûna hawa tirsîyabû. Çend cotkar û karker ji ber mecburîyeta xwe bi motirê xwe berva çolê diçûn. Dengê bîçeran heta gund dihatin. Çend kurik (zarok) jî li ber dûkana gund avacemidî kirîbûn û bi lez dalastin. Rojê jîyan teslîm girtîbû.

Qaso û Silo ji ber germê, xwe avetibûn ber sîya mala Qaso. Sohbeta wan li ser bernameya TV a evarê bû. Di bernameye da behsa şer û mirinê kiribûn. Dîsa pirr leşker mirîbûn. Ji ber propagandaya TV ê li bajarên mezin yên Tirkiyê nijadparestan erişî ser mal û dukanên kurda kiribûn. Li Stembûlê jî xortekî Kurd hatibû kuştin. Li Enqerê di otobûsekî da polîsan kontrol çêkiribûn û di nav çend rêwî û polîsanda şer derketibû. Kesekî ji nav agir dûrketibû, xelasbûbû û dewletê her alîyê bajêr kiribû bin kontrolê.

Qaso kidaxa çayê dîna ser erdê û bi destê xwe mêşên li ser şekirê di tasa da kevitandin û got;

– Silo, halê welatê me çawa be. Şer pirr giran e, ji bo aşitîyeke gav nê avêtin, tu çi difikirî?

Silo got;

– Qaso tu hîn baştir dizanî, desthelatîya welat di destê leşkeran da ye! Erê em terin helbijartinê, lê rastî ne weng e! Tu di wan karûbarên sîyasî da zana yî çi bibêjim.

Qaso got;

– Kekê Silo, zanatî têr nake, gerek rewşenbîrên welêt gavekê bavêjin. Aşitîyê bînin ziman, li welêt nasnameya kurdî, ziman û kultura me were naskirin, zîndan werin valakirin...

Sohbeta du hevalan berdavam kir ku heta ji alîyê jêr da xortekî gund xûya kir. Emir bi lezekê berva Qaso û Silo dihat. Dema hate cem wan silav da got;

– Selamû aleykûm!

– Aleykûme selam Emir, bi xêr hatî, keremke rûnê, got Qaso. Silo jî xort silav kir.

Emir got;

– Kekê Qaso karekî min ketê ser te eger minasib be ez dixwazim bi te ra deng bikim.

Qaso got;

– Baş e, were em herin hundirê malê. Silo tu piçekê rune, em tên. Ew

tevûhev çûn hundirê malê.

Emir got;

– Ez heta gotina xwe xelas dikim pirsa me ke. Kekê ez nîvro çûm nav mezelên gund ku daran avkim. Min dît ku li ber dîwar, bin daran da kesekî ramedîye. Ez bê deng mam û min va kesê xerîb berçavan ra derbas kir. Sîlah di navê da hebû. Bîstekî şunda dema ji xewa kur rabû wî ez dîm û ji navê xwe sîleha xwe kişanda min, got:

– Were vir û dengê xwe meke. Ez hedî hedî çûm cem wî kesî.

Got:

– Min doh evarê li merkeza petrolê dit ku navê gundê we C... û gora dengkirina gundîyan gunde kurda ye, giredayîya kîjan bajarî ye. Min got;

– Kulu-Konya ye. Tu kî yî û tu çi dixwazî.

Got;

– Deng meke, bisekine. Ez birîndar im, alikarîya te gereg e. Ez revîyam û min hevalên xwe wenda kirin, ez nizanim li kudere me. Ez gerila me, te fahm kir. Eger tu min bidî dest ji bo te û malbata te rind nabe. Tu dizanî gerîla ki ye?

Min got:

– Erê dizanim, ez kurd im lê nikanim alikarîya te bikim. Li gundê me hevalekî sîyasî heye ez dikanim xebere bidim wî, ew dikane alikarîya te bike. Metirse te îxbarî dewletê nakim. Havalê biryarê bidin.

Got:

– Baş e. Nufusa xwe bide min û here.

Ez hatim cem te, em çi bikin? Çend roja berê di sohbeta me ya li ber xermana da te got;

– Îxanetê gelê me qir kir.........gotinên te hatin bîra min, min qe çiştek nekir, ez naxwazim îxanetî bikim. Qaso got;

– Te baş kir Emir, baş bû ku me tu kirî berpirsîyarê daristanê mezelan. Bijî. Ma tu kes nebîze! Xwarinekê û avê bidê û bejê evarê seet 11an erebek tê li ber derîyê mezelan disekine eger 2 caran bi lambê îşmar da, ma bazde têkeve erebê. De niha here mal.

Herdu derketin û vegerîyan ba Silo. Emir xatirê xwe stand û çû. Piçekê şûnda Silo jî xatirê xwe xast û ew jî çû. Qaso ketê telaşekê, birîndar e? Ki ye, ma ji alîyê dewletê nebe. Birîna xwe giran be alikarî bi lez gereg e. Cilên xwe pakij in an na?..................Bi sedan pirs di serê Qaso da çêdibûn. Gerek ji malê jî kes nizane, cîran û gundî jî ma nebîzin. Kete hundirê mal û bidizikî ji dolaba kincan çend kinc vedan kirine turikê xwe. Nan û qatix kire ser wan. Ew birin kirin ereba xwe. Ji bermalîya xwe çend hezar perê girtin û berva biçeran ajot. Heyecana Qaso ew zebtkiribû û nedikanî çiştekî bike. Devdeva nezika bîçeran bû, fahm kir ku ew li rîyeka şaş e. Ajot ser girekî û fikiri. Biryara xwe da

ku ew alikarîya xwe bike û kesê xerib, peşmergê gelê xwe xelas bike. Çi gereg be bê kirin. Roj li ber ava bû. Êdin tîna rojê kem bû bû, lê germ hîn jî pirr bû. Vegerî hat mal.

Dema xarina êvarê dixwarin ejensê da bernameya şerê welat hebû û çalakîyên hatinî çêkîrinî şîrove dikirin. Leşkeran bi hezaran berîyê xwe dabûn çîya û banîyan, morala xwe xirab bû. Nan di berda ma û dev ji xarinê berda. Bi jina xwe ra got;

– Ezî herime ba bîçercîyan, belkî îşev terla me werê çinandin, xarinê û çayê hazir bike. Dema hazirî xelas bû Qaso xatirê xwe xast û derket çû. Di serê Qaso da teşqele pirr giran bû, nedizanî çir bike. Ereba xwe sîyar bû û berva qezê da rê. Mezelên gund li ser rîya qezê bûn. Dema nezikî mezelan bû heyecanekê pê girt. Dastîya..... Ajot hate ber derîyê mezelan. Du caran îşmar da ku ev kesê xerîb ma bizane ku nasek hat. Çend deqa çav kir, kesek tune bû. carek din îşmar da. Dît ku ji mezelan kesek derket û berve erebê hat, kolmatek ketê kirika Qaso, bê deng ma. Xort sîyar bû kete paşîya erebê. Got;

– Êvar baş, ez Berzan. De bajo û em hevûdu nas bikin.

– Êvar baş, ez Qaso. Hîn em derneketin re, ez dixwazim sîleha te bigirim û bizanim tu çawa hatî van deran?

Dema Qaso behsa silehê kir xort got;

– Ez nikanim sîleha xwe bidim kesî, ne mumkûn e! Qaso got;

– Ez ne alîkarê dewletê û ne hevalê we me, lê welatparez im. Gerek bawerîya min bi te hebe. Tu bêçare yî, tu peşmerge yî ez nikanim te di wan derên xerib da bêkes û alîkarî bihêlim, dema tu sîleha xwe nedî min ez nikanim alîkarîya te bikim. Dema em ji hevdu dûr ketin tu dikanî sileha xwe dîsa bigirî. Xort got;

– Baş e kerem ke, mermî jê derxistin, kirine berîka xwe û sileh dirêjî Qaso kir. Qaso got;

– De xwe li paş dirêj ke û em derkevin rê, herin cîyekî vala. Li vir sekinandin baş nabe. Qaso ajot çû ser terla xwe. Xort û Qaso ji erebê derketin, li ber ronahîya erebê birîna xort bi paketa tendurîstîya erebê pakij kirin. Birîn ne kûr bû. Cil û bergên ji mal bi xwe ra anibûn dan xort, cilên wî yê bi xwîn û gemara dor alîyê xwe di kêleka terla xwe da kirin binî xalîyê, kevir dan ser.

– Hevaltîyeka nû, bi tirs dest pêkir. Berzan dest bi gotinê kir;

– .................................Kekê gerek ez herim İzmirê, eger tu min bibî baş dibe. Perên min hene û ez mesrefa te didim te. Eger ez li van deran bimînim ez ê werim girtin.

Qaso got;

– Baş e, lê ez nikanim te bibim İzmirê, lê çare heye, ez te dikarim bibim Akşehirê derdixim rîya İzmirê, tu ê li otobûsekî sîyar bî herî İzmîrê. Berzan got;

– Di otobûsa da pirr kontrol çêdibin, ev nabe.

Qaso got;

– Ez te dibim (I...), gundê kurda ye. Li wir, ji ofîsê kamyonên gundên me, genim dibin Izmirê. Tu dikani li yekê sîyar bî û herî İzmirê.

Berzan got:

– Kekê ez ne însanê van deran im, ez çi bêjim, rê dûr e û şofêr gotin û pirsên xwe hebin ez ê çi bêjim.

Qaso got;

– Heta sibê em li wir in, tu ji Gundê (K...), navê te jî Misto yê. Malbata te......................... Ez ê te teslîmî hevalekî xwe kim.

Li ber bewrarê hemberê wan, bîçercîyan karê xwe berdan û ketin xewê. Li dûr dengên kuçikên şivanan, kalekala pezê li başaxa diçerîn û dengê zîl, zengila dihat. Li ewra stêrk dibiriqîn. Herduya jî xew nekete çavan. Heta sibê Berzan nasnameya xwe, malbata xwe, eşîr û gund, doraliyê gundan hevîsî. Dema dersa hînbûnê xelas bû, ji alîyê rojhelat da rojê dest pê dikir.

Qaso ajot derkete ser rîya gundê (B...) ku herin (I...). Devdevê nezikî ofisê bûn, edî kar û telaşa barkirina bar li kamyoncîyan ketibû. Qaso di rêzê da ereben naskirî di ber çavan ra derbas kirin. Dema Cemo li ber erebê dit, dilê wi germ bû û got;

– Ohh, Cemo li vir e. De baş e qet mesele meke, Cemo havalekî welatparêz e û yê te bibe İzmirê.

Cemo jî ereba Qaso dit dest jê ra heyna silav kir. Dema ew hatin cem hev Cemo pirsî,

– Rojbaş kek Qaso tu li van deran çi dikî?

Qaso got;

– Hevalekî min heye, karê wî li İzmirê heye, êvarê li cem min bû, min got rîya baştir ez mîvanê xwe bi te ra bişînim.

– Cemo, got; Mîvanê te, mîvanê me ye jî, li ser ser û ser çavan, kaxizên xwe xelas bikim, em ê derên rê.

Dema Cemo çû, Qaso sîleha Berzan dayê. Qaso, dest bakir dawîya ereba Cemo.

........................................

Demekê şunda, di ejensê da dîsa xeberên reş hebûn. Li İzmirê di çalakîyê da çend kurd hatibûn kuştin û resmên wan didan TVê. Dema Qaso resmê Berzan dît bi hers derkete ber malê, li ereba xwe sîyar bû, ajot çû ser girekî gund û kaseta Şivan kire teyîbê kelegirî bû û bi hestir ani xarê, çend seetan li wir ma.

# HENEK

**Mem Xelîkan**

## SURİ ( BOYNUZ)

Law, ji dayika xwe dipirse; "dayê, tu dizanî ez gewr im. Bûka te jî gewr e. Lê keça min, nebîya te ya nû hatî dinê; wek zencîya reş e. Di kokê malbata me de, qet kesekî reş hebû an na?"

Dayik; "Na na, lawê min, malbata me de qet kesî reş tune wû. Lê tu biçûk wûyî, min tu bi şîrê manga mêjand û mezin kirî. Hêdî hêdî, suri yên te têne der." dibê.

## ZİMAN XAR

Li sala 1927an da, gundê me jî tev li heremên pîlot kiri wûn. Ji bo wê, ji wana gundên doralî yên me, siftê li gundê me dibistan jihevkiri wûn. Mamostek tê gund, teleban(şagirtan) berhev dike ku bide xwandin. Mixtarê gund yekî muqellît wûye. Ji Muellim re kalekî gund nişan dide û dibê "ji vî re bê tu jî were mektebê"

Mamoste jî, ji apê Simo re wer dibê û dibe dibistanê dike nav kurikan. Li dersa siftê, Apê me radike, dibê;

– Bêje, a

– Simo dibê, ooo

– Na na , ne ooo, a

– Simo dîsa dibê, ooo

– Mamoste; a a a dibê, Simo xulî dibe.

– Magî ez nizanime, vaya yî ziman xar dengkirinê bi ber min xê. dibê û derdikeve.

## KU Î KERR HAT

Goristanê gundê me, li derveyî gund û li çiyayên gund mês dike. Rokê, gundî mirîyekî gund dikin bin axê û vedigerine mala eznî. Bi rê de, gundîyek dibê "Xwedê rehma xwe lêke, merîyekî baş bû. Cihê wî bi cennet (bihuşt) be." Yekî li kêleka wî û ji miri hez nake jî dibê;

"Tu guh mede va hesawana, kê got merîyekî rind wû. Îşev, ku î kerr (sorgu meleği) hat, ku vî, dev da çiyayên gund tu were halî vî bivîne."

# Bi zaravî xelika:
# KOSTEK

Nuhê hecê (Nuh Ateş)

**Bi ziravî Xelika: Li gundî Xelika (Karacadag-Qulu-Qonîya) bi devokê ra tewên zirava (zarava). Ev nivîsa bi ziravî kurmancîya Xelika yê dengkirinê hatiye nivîsandin.**

Li gorê hen zaneyan dînê kurmanca yê di ber muslimanîyê zerdeştî wûye. Şaîrê kurmanc Cigerxwîn di kîteba xe ya bi navê "Tarîxa Kurdistan" da tewê, li gorê hen tarîxzanên cîhanê kurmancên êzdî bermayîyên zerdeştîyan e.

Di eynê kîtabê da Cigerxwîn qala kostekê dike û wer tewê:

"Kostî yan kostek beneke nav bi qul e. Du caran li pêş û du caran li paş girê didin û li ser xirqê pîra girêdidin.

Ev kostek ben û xirq e, ji rewşa kevnarê Îran bû. Çawa Zardeşt hat di ola xwe de pîroz kir û hetta niha jî kurdên êzdî li ser xirqê yê pîroz girêdidin." (Cigerxwîn, *Tarîxa Kurdistan,* rûpel 26)

Kostek ben e. Benê navê, benê duxinê sembola nefsgemkirina li ber xeramîyê ye jî. Benî navê yan duxinê li ber heramîyê venekirin şert û şireteke dînî ye û di dinê islamê da jî navgiran e.

Kostek huro jî di kurmancîya Xelika da derbas tewe, nimûne "kosteka seetê". Di kilameke li ser Hecîyê Buxircî da jî kostek derbas tewe. Hecîyê Buxircî (ji Omera ye) eşkqîya wû û 80-90 salî di ber vê bi eşqîyakî din, Xeloyê Deli Pepê (ji Boxazqayê ye) va hatiye dardakirin.

Çend rêz ji kilameke li ser Hecîyê Buxircî weng in:

Hecî efendî miro ku we çing bihîsto
Ha qurbana kosteka seetê le pîsto
Cinganeki gemarî bi çar pera
Le ser qefesa gewr rûnişto
Ha bû ha bû Hecî efendî ha bû
Kêndira Mistefayî Kêmêl li dar babû
Axtê ku Hecî efendî vi dar xistin
Perçema reş le henîya gewr ta bi ta bû

(Ji devî Fata Îsmê a rehmetî - ji Xelika ye)

Zemanekî li Xelika zevi bi hespan diçînîn û xerman bi hespan heydinan û dîtinan. Barê sewê ku hesp tavli bibin ew li kortê bergîra li ber çêm diçêrandin. Tê bîra min, carna li çemî hefşî Hecê yê ku çêrê li dorê rind dirûzt, herdê bi çêrê kirê dikirin û hesp lê diçêrandin. Hingê hespên nêr kostek dikirin, nigekî peşî bi nigekî paşî va çeperast bi benekî (kostek) girê didan. Sewa çi hespên nêr

kostek dikirin? Sewê ku ew baznedin ser mehinan, tavli bimên û jar nekevin.

Niha tune, berê edetek hewû, jê ra digotin “kostek qetandin!” Axtê ku kurik (zarok) ji çarpê gerîne derbase bi pê gerînê tewû, kostek diqetandin.

Kurik berê bi çarpê digere. Bi çarpê gerînê dest û pîyên wî pît tewin. Bi çarpê gerîna kurika bi zehmet e, tê beyî ew î kostek kirine. Paşê ew li ber xe tede ku rawe ser pîyan û bi pê bigere. Kîngê ku wî bi şa kir bi pê bigere, hîngê kostekê diqetînin. Bi pê gerînê va ji bo wî dem û dewraneke nû destpê dike. Pesrpektîva mêzkirina wî tê guhêrîn. Ew prosesa bi kostek qetandinê tê taçkirin. Yanê kostek qetandin sembola xelasbûna ji zehmetîya ye ji bo kurikan.

Qeyda û seremonîya kostek qetandinê weng wû: Royê kostek qetandinê li ber malê zarok şênayî çê tewû. Dê û dutê malê, kurikên mehlê li wir kom tewûn. Li pêş xanîyê malbatê zarok bi rûşkandin tedan û bi benekî her dû pêçîyên nigan ên girkê bi hev va girê didan. Kurikên li wir kombûyî yên 6-7 salî diwûn du bira. Bi şîmardayînê her du bir her yek bi alîyekî da di dor xênî ra bi bez çex tewûn û bi şû va dihatin ba zarokê niggirêdayî. Ku ki zû hat û kostek vekir udek tedana wî. Xudanê malê şekir û fistiq, mûj û mişqûl li kurikan belav dikir.

*Almanya, 26.03.2008*

# NETKI

Piranîyên peyvan, di rewşên xwe da tên bikaranîn. Dema ku jîngehên peyvan winda dibin, peyv jî têne bîrkirin. Jîyana pêyvan girêdayîyê şertên jîyanê ne. Deme ku jîyan tê guherandin, peyv winda dibin, têne bîrkirin û li cihên wan peyvên nû têne dunê. Zimanî zindî ye û prosesek e ku bêdawî ye.Ziman î tarîxî ye. Eger em dixwazin zimanê xwe qelew bikinî gerek em tiştên kevn biparêzin ûderxin ortê û binivîsînin.

Kûrik wê wextê, dema ku televîzyon û computer tune bûn, wan lîstik bi xwe xulk dikirin an jî lîstiken berê dihilistin.Wê wextê zarok pir bi kît, hotê ço û bi listikên din dihilistin. An jî ji paç dikirin gilok pê bi hotê(futbol) dihilîstin.

Kîjan lîstik dibû ma bibûya, di navîne listikê da, dema ku me dixwast em tenek nefes heynîn û li ser rê û rêzanê listîkê tiştekî muneqeşe bikin an jî nizhan çareser bikin me digot; netki û listik dadiwestî. Deme ku mesele çareser dibû, îstikê dîsa dest pê dikir.

Eger di lîstikê da ku kurikinê izik dibûn îşî me yî temam bû. Wanan pir caran nizhe dikirin û lîstîk dirêj dikirin. Mahnê netkîyê tam hemberî xwe bi îngîlîzî time out e. Bi tirkî hemberê xwe tê mehnê mola lê tam mehne netkîyê nîne cîh.

Hot: yuvarlak,top
Izik: oyunbozanlik
Nizhe: itiraz

Seyfi Dogan

# Bizin xurî, perê xwedîyê xwe xwar

"Bizin ku xûrî ya here nanê şivên bixwe."

Bizinî bi înad in. Kerrî pez ku mexel hat, şivan ê bi bizinan re mujil buwe. Bizinên di nav pêz da mexel nayên, yê tim ji nav pez veqatin. Bizinên herin di hortê golê de, li ser kevir mexel bên. Bizinên di nav pêz de naçêrin ê herin di harim, baxçe, zevî û zîyana kevin. Bizinên di nav pez da, mîna pêz dokime naxwin, ê helkişin ser heviz bixwin.

Jî ber vê şivan û xwedî bizina tim bi bizênan re şeng û beng dibin.

Piranîyê kurdan dewarên xwe bi maldarî dikirin. Hezkirin, dil û dildarî, êvîndarî xort û keçan, kilam, bilûr, qasîde ê bêt gotin. Xemgînî, şa bûn, jêhatî, mêrxasî, pesandin, malevanî û kevanî tim û tim li ser pêz û bizinan hatine gotin.

Va çêroka li navçê Încovê di dema xwe de qewîmîye, hinekî rast e, hûnandin û li hev anîn ji alî nivîskar de pêk hatiye. Bûyer ji henekan ve dest pê dike û rastîya çêrokê bi hûnandin û li hev anîne ve meselê xweş dike. Kurd, hekat û mesalên xwe bi devkî xweş û geş dikin. Min jî xwest bi xwendavanan re vê çêrokê parve kim.

**Ahmet Gezer**



Mêrikekî bizinên xwe hebûne, dema bizin qusandine, banî der û cîranên xwe dike, dibê bi min re mûyê bizinan bibirin. Der û cîran lê digên hevdu, jê re mûyê bizinan dibirin. Pênç Pênç hezar qayme perê wê çaxê acer derkatine, pênç hezar pir pere ne û bi qîmet in jî, ku em bi îro re beramberî hev bikinî mîna 500 hezarî niha ye. Mêrik wê rojê pere di berîka ceketê xwe de bûne, çiqas pere bûne mêrik vê jî nizane. Şuna ku ceketê xwe bi darxistî, zêde ne bilind bûye. Mêrik û cîranê ku pê re bizina bibirin, dest bi birînê dikin.

Pez birandin jî bûyereka mezin bû, di dema xwe de. Neh, deh merî lê dicivîn, pez dibirin. Bi yên ku pez dibirin re digotin " Qusîsî" yên ku pez rind, zû û li qêrarekî bibirin pak, pakêj û li reqekî 50 pezê dibirîn re digotin qusîsî. Berê bi hebringê dibirîn, ji şuva meqes jî derket.

Bizinek devê xwe dike berîka mêrik, pênç hezar perê mêrik bi devê xwe derdîxe, dîcû û dixwe.

Ji nîvro bi şunda mêrik pê dihese ku

pênç hezar pere wî tûnene, wirde û wêda li pera digere, nabîne.

Tê bîra mêrik ceketê xwe li hewşê (hevlî) bi darxistibû, diniqite fikra mêrik ku bizinan pere wî xwarine.

Di vê navberê da cîranê xwe tê ba wî, hal û meselê ji ciranê xwe re jî dibêje.

Herduk jî dikevin hundirê gomê, li der û dorê mêze dikin, pera nabînin.

Bizin piştî nîvro di hevlîyê de mexel hatine, mêrik berê xwe dide bizinan. Bizinek dûka ye. Mêrik bi ciranê xwe re dibê; va bizina dûka ye, ez dibêm vê perê min xwarine, ê loma pir dûka ye. Ware em vê bizinê şerjêkin? Em mêz kin ka pênç hezar pere di hûrê vê de heye?

Bizina ku dûka, yê şerjêdikin, hûrê wê mêz dikin pere di hûrê vê bizinê de tune.

Mêrik û cîran dîsa vedigerin hundirê hevlîyê, mêrik dibê; va bizina ku çavê xwe gewir kirî û şaş mêze dike, ez bêm vê pere xwarine. Ware em vê şerjêkinî? Wê bizinê jî şerjêdikin, pere di hûrê wê da jî tunene.

Dîsa tên hevlîyê mêrik dibê vê bizinê serî xwe di herdê re birî, ez bêm vê perê min xwarine, ware em vê bizinê jî şerjêkinî. Û pere di hûrê wê bizinê de jî dernakevin.

Mêrik înad kirîye ku perê xwe bibîne, dibe vê bizina çavê xwe kirpand. Ez bêm pere vê xwarine û wê jî şerjêdike, bizina ku çavê xwe kirpandî jî şerjêdikin, pere



di hûre wê de jî tunene.

Dîsa tên hevlî, bizinek qet nalive û bê hareket e.

Mêrik dibê; maka oynîkê vê gemî, ez bêm avê me dixapîne vê pere xwarine û wê bizinê jî şerjêdikin. Di hûre wê da jî



pere dernakeve.

Dor bi dor bizina penç û şeşan jî şerjedikin, pera di hûre wan bizinan de jî dernakeve.

Bizina heftan bi tenê dimîne, mêrik dibê; ez ê vê bizinê jî şerjêkim. Ez ê ji xwe va bi xûyakirin bidim û qaxî bi ber serî xwe dim, bizina heftan jî şerjêdike. Pênç hezar pereyê xwe di hûre vê bizina heftan de dibîne.

Mêrik li dawîya dawî pênç hezar pere xwe dîn û pê şa bû.

De vê carê mêrik hesabê heft bizina nekir, ka çiqes pere digrê.

# ZIMAN û ZÎHNÎYET

Nuh Ateş

## Pirzimanî, pirwelatî, piralayî...

Di serdana xwe ya Swêdê de li serê vê salê serokwezîrê Tirkîyê Erdogan li ser pirsên rojnamevanan wer gotiye:

"Li Tirkîyê ji tirkî bêtir zimanekî din î resmî tune, nabe!

Yek milet, yek welat, yek al, ... ma ji vê tabîtir çi heye?

Ez ji we dipirsim, kîjan welat di nav hududên xwe da hebûna du welatan qebûl dike û dikane bibêje du alayên vî welatî hene?"

Wî di hevdîtina xwe ya bi sazîyên sîvîl yên Amedê va jî gotiye, "Li tu derên dunyayê perwerdeya makzimanî tune!"

Rastîyên pir dewletan van gotinên Erdogan pûç dikin û wî derewîn yan bêhay derdixin. Pir dewlêtên li rûyê dunyayê pirzîmanî ne, lê perwerdeya makzimanî yan duzimanî heye:

Li Kanadayê frensî û îngilizî du zimanên resmî hene. Li Brîtanya Mezin îngilizî ji bo tevayi zimanê resmî ye, lê skoçî, gelêrî, walezî jî li heremên xwe resmî ne. Li Îtalîyayê îtalî zimanê resmî ye, lê li herêman, nimune li Tîrolê almanî û ladînî jî resmî ne. Li Îswîçreyê almanî, frensî, îtalî û retoromanî çar zimanên resmî hene. Li Luksenburgê luksenburgî, almanî û frensî sê zimanên resmî hene. Li Belçîkayê flemanî, walonî û almanî sê zimanên resmî hene. Li Hollandayê li hêla hollandî frîzî jî resmî ye.

Li Espanyayê espanî (kastîlî) li tevayî Espanyayê zimanê resmî ye, baskî, katalanî û galîçî li herêman resmî ne.

Li Afrîkaya Başûr 11 zimanên resmî tênê bikaranîn.

Li İraqê erebî û kurdî du zimanên resmî hene. Li Fînlandîyayê li hêla fînî swêdî jî zimanê resmî ye. Li Kosovayê albanî û sirbî du zimanên resmî hene.

Li Awisturyayê almanî zimanê resmî ye, lê li herêma krowatî û slowenî jî wekî zimanên resmî û perwerdeyî tên qebûlkirin. Li Elmanyayê almanî zimanê resmî ye, lê danemerqî, Sorbî û frîzî ji li herêman wekî zimanê resmî û perwerdeyê tên qebûlkirin.

Zimanên resmî li van dewletan zimanên perwerdeyê ne jî.

Ji dewletên pirzimanî gelek pirmiletî, pirwelatî û pir alayî ne jî. Mînak: Espanîya him navê dewletekê him jî yê welatekî ye. Lê herêmên wê yên wekî Bask, Katalonya, Galîçya jî navên resmî ne û ji bo niştecîyên wan herêman welat in. Li wan herêman yên ku xwedîyên statuyeke otonom in, li hêla ala Espanîyayê alayên baskan, katalan û galiçan jî li dar e. Minakên bi vî tonî gelek in.

## Ma statuya komhindikanî gunehkarî ye?

Di serdana xwe ya Swêdê da Erdogan gotiye, "Awrûpî welatîyên me yên kokkurd wekî komhindikanî (mînorîte) dibînin. Naxêr, ew ne komhindikanî ne. Ku we bi hemwelatîyên me yên kurd ra got, hûn komhindikanî ne, ew ê we bidin ber kut û pînan û we bavêjin der. Çimakî ew unsurên me yên eslî ne."

Erdogan di hevdîtin û mineqeşêyên xwe yên bi nunerên sazîyên sîvîl yên Amedê va da jî gotiye, "Perwerdeya makzimanî tenê ji bo komhindikanîyan e!"

Gotinên wî hevdu nagrin, pûç dikin. Erdogan him statuya komhindikanîyê wekî tiştekî xeraw, wekî kêmheqîyekê nişan dide, him jî dibê, heqê perwerdeya makzimanî tenê ji bo komhindikanîyan derbas dibe.

Gava ku kurd perwerdaya makzimanî dixwazin, ew lê vedigerîne dibê, nabe, ji ber ku kurd li ba wî ne komhindikanî ne, "unsurê eslî" ne. Yanê ew "unsurê eslî" di ser komhindikanîyê ra dibîne. Ma çawa dibe ku heqê perwerdeya makzimanî ji bo komhindikanîyê heye û ji bo "unsurê eslî" tune ye?

Ma komhindikanî yan statuya komhindikanîya milî gunehkarîyek e?

Xumeynîyê kevneperest û olperest jî di wexta xwe da li dijî xwazteka kurdên Îranê ya li ser statuyeke otonom derketibû û gotibû "otonomî guneh e!" Kî dizane, belkî wî otonomî wekî îcadeke gawiran dihesiband.

Komhindikanî statuyek e, pê ziman û nasnameya komdikanîyê li hember piranîya miletên serdest tê parêztin. Nimûne, Elmanya wekî ku min li jor qal kiriye, komhindikanîyên danemerqî û sorbî li gorê peymana Konseya Awrupî di statuya Komhindikaniya Milî da dibîne û mafê perwerdaya makzimanî ji bo wana qebûl dike. Nifusa komhidikanîya danemerqî veqasî 8.000 û 50.000 tê nişandan û ew li eyaleta Schleswî Holsteınê(SH) dijîn. 60 helûne zarokan, 48 dibistanên wana hene. Perwerdaya li helûn û dibistanên wan duzimanî ye. 540 mamoste di van dibistanan da kar dikin. Xercîyên van dibistan û helûnan ji sedî 43 li ser dewleta elman (eyaleta SH) û ji sedî 3 jî

li ser şahredarîyan e. Yên mayî ji kesikî dewleta danemerqî û komhindikanîya danemerqî dertên.

Ma dibe ku komhidikanîya danemerqî bibê, em vê statuye naxwazin, yan ji bo vê almana bidin ber kut û pînan? Min qet nebihîstîye ku ji bo statuya komhindikanîyê bi vî tonî kesekî kesekî din pîn kiriye.

Ma heger Erdogan heqê perwerdeya duzimanî ji bo kurdan qebûl bike, kurd dê wi çima bidin ber pînan!?

## Dersa makzimanî

Erdogan rastîya Elmanyayê jî bi tevayî nizanê yan jî wê şaş dinimîne. Miqeyesekirina gelê kurd yê ku li ser axa bavûkala niştecî ye bi tirkên mihecîr yên li Elmanyayê va ne di cîh daye. Li Elmanyayê ji 180 miletên cûda piçûk yan mezin kom û komikên mihecîr hene. Elmanya wana wekî komhindikanîyên milî nabîne û qebûl nake. Lê ji bo zimanên mihecîran imkanên hêvîsîne pêşkêş dike. Dersa makzimanî ji bo zarokên mihecîran hemahema li her eyaletê Elmanyayê heye. Dersa makzimanî ne mecburî ye, li gorê xwazteke dêûbavan danê êvarê 3-5 seatan tê amadekirin. Nimûne tenê li eyaleta Elmanyayê ya ku ku bi nifusa xwe mezintir e 1.400 mamoste kurdi û tamîlî jî tevê bi 18 makzimanan dersê didin. Ji xercîyên dersên makzimanî û mamostêyên wê para mezin ji keskî Elmanyayê, ji butçeyên eyaletan dertê.

Rastî ew e ku kurd li Tirkîyê veqasî mihecîrên li Elmanyayê jî ne xwedîyê imkanên hêvîsîna makzimanê xwe ne.

## Zîhnîyeta înkarê

Dewletên ku min di destpêka vê nivîsê da qal kiriye rastîyên xwe yên pirzimanî û pir gelî yan pirmiletî di makqanunên xwe da bi nav dikin. Îswîçrê miletê xwe wekî “ Yekîtîya Gelan” binav dike. Êspanya di makqanunê xwe da qala “gelan” û “ miletê tarîxî” dike û miletê êspanî wekî ji wana peydabûyî salixdide û bi statuya otonom wana xwedî maf dike. Belçîka miletê belçîkî wekî ji sê civatên ziman cûda peydabûyi salixdide û bi statuya federalî heqê wana yê perwerdaya makzimanî û xwebixwe idarekirinê garantî dike.

Yanê pirsa ziman û perwerdeya makzimanî yan duzimanî bi navkirina xwedîyê wana û naskirina nasnemeya wana va girêdayî ye.

Lê li Tirkîyê ne wer e. Li wir heye û tuneye, tenê miletê tirk hene. Lê kurd çi ne? Ma nav û statuya wana çi ye?

Rastî ew e ku kurd li Tirkîyê li gorê makqanuna Tirkîyê ne tiştek in, tunin. Ew bi resmî ne wekî miletekî yan gelekî bi serî xwe ne jî wekî komhindikanîyeke milî tên naskirin û qebulkirin.Tu statuya wana ya resmî ji tune.

Erdogan di hevdîtina xwe ya bi sazîyên sîvîl yên Amedê va li ser mijare binavkirina pirsa kurdan gotiye, “ez bi çavekî aborî lê mêz dikim!” Yanê pirsa kurd li ba wî pirseke aborî ye. Siyesetmederên Tirkîyê yên berî Erdoganjî va dîtîna bi salan dianîn ziman. Ji devên berpirsyarên Tirkîyê meriv carcaran gotinên wekî “eslî unsur” û “hemwelatîyên kokkurd” dibihîze. Lê van navlêkirinan jî di tu belgeyên resmî da cîh nagrin. Hemwelatî bi awayê resmî wekî tirk tê salixdan. Li gor vê “hemwelatîyên kokkurd” jî li dawîyê tirk in.

“Unsurê eslî” gotineke sergirtî ye û bi mekseda xapandinê tê bikaranîn. “Unsurê eslî” çi ye? Tu tarîfe wê yê resmî û zelal tune. Heger ji vê meksed qebulkirina kurdan wekî miletekî ji xêyrî tirka ye, hîngê çima ew di makqanuna Tirkîyê û di belgeyên din ên resmî da nayê bi navkirin? Ma ew çi “unsurê eslî” ye ku makzimanê wî di dibistanan, meclîs û mehkeman da qedexe ye?

Di sayê gotinên Erdogan yên ku min di vê nivîsê da cîh dayîye meriv digêhe bîrûbawerî û zîhnîyeta wî û partîya wî di derbarê pirsa kurdan da. Ew jî zîhnîyeta înkarê ye.

Di xala bi navê “Rojava û Başûrê Rojava” ya programê AKP (Partîya Edeletê û Avadanîyê) li ser mijara ziman wer hatiye nivîsîn:

“Cudayîyên li vê herêma me ji alîyê partîya me da wekî dewlemendî tên qebûlkirin. Bi şerta ku zimanê resmî û zimanê perwerdeyê tirkî ye, partîya me weşan jî tevê falîyetên kulturî bi zimanên ji xêyrî tirkî wekî dewlemendîyeke ku pê yekdestîbûn û bihevrabûna li welatê me pît dibe dibîne.” Wisa dibînê, lê zimanê kurdan di qada resmî û perwerdeyê da bêpar û bêqimet e.

Di programa AKP da navê welatê kurdan yan jî heqê ku kurd pê bikanibin navên welatê xwe û yê gund û bajarên xwe serbest helbijêrin tune. Kurd wekî milet yan jî gel nayên binavkirin. Zimanê kurdî jî nehatîye binavkirin. Madem cûdatîyên herêma Kurdistanê dewlemendî tê hesibandin, gelo çima rê li ber venakin ku va dewlemndîya bikeve dibistanan, meclis û mehkeman? Eger hebûna zimanê kurdî bi rastî wekî dewlemendîyekê tê dîtinê, hingê perwerdeya bi zimanê kurdî çima qedexe ye?

Bi zîhnîyeta înkarê AKP jî mîna CHP (Partîya Cumhurî ya Gel) û MHP (Partîya Hereketa Mîletperestî) ye.

CHP di daxûyanîya xwe da ya bi minesebeta kombûna xwê ya 32 ya li meha nîsana îsal dibêje, “Pirsa kurd di eslê xwe da pirsa demokrasî û pêşvabirina aborîyê ye!” Çarelêkirina pirsa makzimanî di daxûyanîyê da

wekî peydakirina îmkanên hêvîsîna wî bi rêya kursên xas hatiye nîşankirin. Di deftera CHP da jî, Kurd wekî gel, Kurdistan wekî welatê wan, perwerdeya makzimanî û duzimanî tune. Tenê qala kursên xas tê kirin. CHP hosteyê zîhnîyeta înkarê yê kevintir e. AKP li herdê wê hîn dajo ye.

## Ezîyeta kursa xas

Wekî CHP, AKP jî kursa xas favorîze dike. Erdogan di serdanên xwe yên welatên Awrupayê da qala wê dike û wê wekî îmkaneke mezin û heqdayînekê pêşkêş dike. Ma çend kursên xas bo hînbûna kurdî li Tirkîyê hene? Ma xwedîyê kursê dê mamoste ji ku pêyda bike û li Tirkîyê mekteba mamosteyên zimanê kurdî heye?

De tu ware wê, vekirina kursên xas jîne karekî hêsan e. Çir bû nizanim, ji bo kursên xas duzanameyek hebû. Devê şorê ye, sêriye xwediya bixwe, sêrek bû. Di wê da cûr bi cûr esteng û kostek hene. Li gorê wê, ku meriv bixwaze kurseke xas ji bo hînbûna kurdî veke, gerek e ku dersxaneyeke xas amade bike. Gerek e ku derî, pencere û merdîwanên wê jî xas bin... Û textereşekî wê yê xas jî hebe. Mamosteyeki xas û dergewaneki xas bê ragirtin. ... Welhesil her tişt xas û bi meşeqet be û xerc û xurc jî gîşt ji keskî xwedîye kursê û beşdarên kursê be. Bi ser da jî, kurs ji bo her salgrubê ne vekirî be. Ez dirêj nekim, bi gotinê paşîya şert û şûrtên duzanameya kursên xas naye. Bastir e ku meriv wê wekî „duzanameya ezîyetên xas" yan jî "ezîyetnameya kursên zimanê kurdî" bi nav bike.

Ma rola dewletê di vir da çi ye û ew ji bo kursên xas kîjan bar û xercîyan heldine ser milê xwe?

Rola wê, di qada jîyana xas da jî kur kirin û bendkirina heqê hêvîsîna zimanê kurdî ye.

Li gorê vê duzanameyê jî kurdî wekî zimanekî bi serî xwe naye qebûlkirin û wekî zarava (lehçe) tê binavkirin. Nimune, nivîskarê Bîrnebûnê Îrfan Baysal çend sala berî vê, sewa vekirina kurseke xas ji bo hêvîsîna kurmancîyê li qesebaya Hecîlera (Cîhanbeylî) serî lê dabû. Meqamê qaymeqamê Cîhanbeylîyê serlêdana Îrfên qebûl nekiribû, ji ber ku wî di serlêdana xwe da gotibû "kursa zimanê kurdî". Berpirsyarên qaymeqamtîyê xwastine ku ew vê biguhêrê bike, "zaravayê kurdî" (bi tirkî: Kürtçe Lehçe). Ecebê mêz kin, ma kurdî zaravayê (lehçeya) kîjan zimanî ye?

Ez li şûna Îrfên bûyama, min ê biguhêrîya û bikira "kursa zimanê çûçikê".

*Elmanya, 14.05.2008*

# ÇEM

Seyfî Dogan

di nav zeviyên kortê bargîre da
çemî malê heskê
bi şev
wek zîv
û
bi ro
wek zêr
diherikî

şivanan kerîyên pêz
bi kuşlux têdixistin ser avê
dengî
bilûrên wanan
qamîşên kevî
yê çêm

pêl û pêl

wek destmalê
bûkê dihejandin

li hember çêm
zozanê girî qocê
li ser pîyê rastê
bewrarê deştê
û çîyayê înê

gewr û hewsoyên besaxile
li peş
deşta axylonê
rîya herîrî
û rîya
hec û helepê

karwanên bargiran û barbiha
karwanên hececîya
li bin hîvê
ber ve başur û bakur diherikîn
û şopên xwe şên û dewlemend
dikirin

li kevîyê çepê
girê ji xuliyê
li dawîyê gir

darên bî
li ser pîyên darên bî helinên leglegan

û li herdu alîyên çêm
serpêhatiyên hezaran

li ber nênikên kanîstankên zelal
porê xwe
bi şehî xelat şeh dikir

xwe li ser pêlan hêl dikir
û min xwe wek  serdarê pêlan didî
rêwîyên xwe cîwan
gemîyên aşqê bi ajnikirin
jiyanê teze û hêsa
hed û hesap tune bû
wextê serxweş
hestirk hevalên min
xeyalan pêşîyê li boşê
hundirî bêxem
li ser lêvên min kilam
ufuq li piştî hevdu bêdawî
çem xewneke hêvî
ez sîwarê hespên sipî
de were îro megrî

cara dawiyê ku min çem dî
serî di berda
çavên di kortê da
li dor û alî
tûrikên resên gemarî

wek hespekî
di dûganê da
westî
û wek
aveke
tî
diherikî

# HÊVÎDAR BE

Mem Xelîkan

*Çima gula min çima*
*Nû pel didî*
*Dibê jî hêvîya min nema*
*Jiyan bi berxwedanê xwaş e*
*Ew çi tirs û çi telaş e*

*Delalê meke*
*Nû pel didî jiyan xwaş e*
*Biskan berde ser dêma*
*Ji xema dilan re berbake*

*Wek kulîlka Newrozê*
*Ji destpêka biharê re vedikî*
*Deşt û çiyan dixemilînî*
*Sor û zer reng û reng dikî*

*Dawîya her jiyanekê mirin e*
*Zanim rê lê nabe*
*Nebêje*
*Tenê nakim bê te nabe*
*Êşa mirinê sê roj an çar in*
*Delala kê meke*
*Hêvîdar be*
*Ji jiyanek bi rûmet re*
*Hêvîyên xwe bi star ke.*

(2008)

# İÇTOROSLAR'DAN BİR DEVLET ADAMI VE ŞAİR: KENAN PAŞA

Mehmet Bayrak

Osmanlı döneminde, padişahlardan başlayarak devlet adamlarının edebiyatla ilgilenmesi ve şiir yazması adeta bir gelenektir. Bunlardan, gerçekten yetenekli ve eğilimli olduğu için bu uğraşa yönelenler olduğu gibi, salt gelenek ve bir entellektüellik gösterisi için buna yönelenler de vardı.

Nitekim, Yavuz Sultan Selim'le Şah İsmail arasında vukubulan Çaldıran Savaşı esnasında Osmanlı ordusu içinde önemli yararlıklar gösteren Bayezidli Kürt aşiretlerinden bazı aileler, ödüllendirilmek üzere Maraş'a yerleştirilmiş ve burada adeta Osmanlı hanedanının yöresel temsilciliğini yapmışlardır. Cumhuriyet döneminde Bayazıt soyadını alan bu aile, 16. yüzyıldan itibaren birçok yöneticilik görevi üstlenerek bir bakıma bölgenin egemen beyliği olan Dulkadiroğulları'na alternatif bir güç oluşturmuştur.

İşte, bu süreçte yer alan şair – devlet adamlarından biri de, ünlü Osmanlı yöneticisi Kalender Paşa'nın yine ünlü oğlu Süleyman Paşa'nın oğlu **Yusuf Kenan Paşa**'dır.

**Kısa Özgeçmişi**

Gerçek adı Yusuf Kenan olan Bayezidoğulları ailesine mensup Kenan Paşa, 1830 yılında Maraş'ta doğdu. Annesi Dülkadiroğulları'ndan Şerife Hanım'dır.

İlkeğitimini Maraş'ta yapan Kenan Bey, henüz küşük yaştayken babasının ölümü üzerine, mirülümeralık rütbesiyle paşa olur. Zaten yöneticilik, yörede babadan oğula geçmektedir.

Öğrenimini tamamlamak amacıyla annesiyle birlikte İstanbul'a gider. Bir süre sonra askeri rütbesi mülkiyeye dönüştürülerek, 1845 yılında Sadaret Mektubi Odası'nda memurluğa başlar. 1860 yılında ikinci sınıf rütbeyle Hariciye ve Sadaret Mektupçuluğuna atanır. Daha sonra Tunus Kapıkethudalığı, Dahiliye Müsteşarlığı, Mahkeme-i Nizamiye üyeliği, Şura-yı Devlet üyeliği gibi görevlere atanan Kenan Paşa; 1841-42 yılları arasında kısa bir süre için Maraş Valiliği görevinde de bulunur. Kenan Paşa'nın son görevi ise Sadrazam Ali Paşa'nın danışmanlığı ve özel kalem müdürlüğüdür.

Uzun boylu, esmer ve seyrek sakallı olduğu belirtilen Kenan Paşa'nın, elde resmi bulunmuyor.

1876 yılında ölen Kenan Paşa, Merkez Efendi Kabristanı'na gömülmüştür. (Bkz. Mehmed Süreyya: **Sicill-i Osmanı,** Cilt-IV, s.85; Besim Atalay: **Maraş Tarihi ve Coğrafyası**, İst. 1923, yen bas. İst. 1973, s.158;İ.M.K. İnal: **Son Asır Türk Şairleri,** 2. bas. İst. 1988,s. 859; Cemil Çiftçi: **Maraşlı Şairler, Yazarlar** ve Alimler, Kitabevi yay. İst. 2000,s. 168)

**Edebi Kişiliği**

Maraş'ta ve İstanbul'da çeşitli üst düzey görevlerde bulunan Kenan Paşa, şiirler ve şarkı sözleri de yazmış, ancak şairlikten çok inşa yazarlığı yani düz anlatımlı ürünleriyle şöhret kazanmıştır. İçkiye son derece düşkün olan bu zatın, Bakanlar Kurulu tutanaklarını, içerek yazdığı söylenir. Evinde şiir ve musiki sohbetleri yapılan Kenan Paşa'nın cömert bir insan olduğu kaydedilir.

Biri düz yazılarından ve mektuplarından oluşan **Gülşen-i Suhan** *(Söz Bahçesi)* adlı 32 sayfalık; diğeri şiir, şarkı sözü ve diğer anlatı ürünlerinden oluşan **Âsâr-ı Kenan Bey** *(Kenan Beyin Eserleri)* adlı 143 sayfalık iki eseri bulunuyor.

**Şiirlerinden Örnekler**

**Şarkı**

*Gönül tesir-i gamla nâlândır*
*Cihan şimdi bana beytü'l- hazandır*
*Bela-yı fer fetenden mi nedendir*
*Cihan şimdi bana beytü'l- hazandır*

*Saba var yâre bahtımdan figat et*
*Götür hunab-ı çeşmim armağan et*
*Sorarsa hâlimi böyle beyan et*
*Cihan şimdi bana beytü'l-hazandır*

*Beni men etti hicranın emelden*
*Yıkıldı hâne-i hatır temelden*
*Ben artık ihtiraz etmem ecelden*
*Cihan şimdi bana beytü'l-hazandır*

**Şarkı**

*Mest-i zehr-i firkat-ı hicranınım*
*Hasta-yı nevmid-i bi- dermanınım*
*Ben helâk-ı navek-i müjgânınım*
*Sevdiğim şâyeste-i ihsanınım*

*Dâd edip geldim der-i divanına*
*El uzattım dâmen-i ihsanına*
*Redd-i feryad etme düşmez şanına*
*Ben senin eski kulun kurbanınım*

**Şarkı**

*Sislendi hava tarf-ı çemenzarı nem aldı*
*Bülbül yuvadan uçtu, gülistanı gam aldı*
*Bağlar bozulup bezm-i vefa şekline girdi*
*Gülzar-ı muhabbette yine şenlik azaldı*

*Bir gün seni elbette eder vâsıl-ı canan*
*Bu ah-ı sehergâh ile bu hal-i perişan*
*Bak bülbüle sabreyle gönül eyleme efgan*
*Hengâm-ı güle, nuş-i müle şunda ne kaldı*

*Hayrette benim sûzişime âteş-i sûzan*
*Tufan-ı kaza cuşiş-i çeşmanıma hayran*
*Canımdan usandırdı beni naz-ı tabiban*
*Biçare gönül pister-i mihnette bunaldı*

**Şarkı**

*Ol kaşı keman, cevr ü cefa yayını kurdu*
*Tir-i nigehi murg-ı dil-i zârımı vurdu*
*Peykân-ı gamı geçti cigergâhıma durdu*
*Âşıklığımı nâlelerim halka duyurdu*
*Sultan-ı kader neyleyim böyle buyurdu*

*Mehcur olalı ol gül-i nâdide- edadan*
*Kurtulmadı biçare gönül har-ı cefadan*
*Feryadımın aksi geliyor semt-i semadan*
*Âşıklığımı nâlelerim halka duyurdu*
*Sultan-ı kader neyleyim böyle buyurdu*

*Müjgân oku sinemde edip kârını icra*
*Hun-i ciğere çeşm-i teri eyledi mecra*
*Yârin işidip güldüğüne ağlamam amma*
*Âşıklığımı nâlelerim halka duyurdu*
*Sultan-ı kader neyleyim böyle buyurdu*

**Şarkı**

*Nâr-ı aşkınla senin ey nev-civan*
*Döndü âteş-i zâra cism-i nâ-tüvan*
*Hasret-i hâlinle hâl oldu yaman*
*Döndü âteş- zâra cism-i nâ-tüvan*
*El-aman âhû bakışlım el-aman*

*Sîne-i mecruhun ey cân pâresi*
*Göz göz oldu hasretinle yâresi*
*Lutfuna kaldı bu zahmın çâresi*
*Döndü âteş- zâra cism-i nâ-tüvan*
*El-aman âhû bakışlım el-aman*

*Kalmadı gönlümde ârâm ü sükûn*
*Hâlim oldu âleme hayret- nümûn*
*Pençe-i cevrinde kaldım pek zebûn*
*Döndü âteş-zâra cism-i nâ-tüvan*
*El-aman âhû bakışlım el-aman*

# İSLÂM ÖNCESİ KÜRT ŞİİRİNDE YARESAN-ALEVİLİĞİ

Mehmet Bayrak

Mezopotamya ve Anadolu; tarihsel geçmişi yedibin yıla dayanan, yazının ilk kullanıldığı bir coğrafya olmasının yanısıra, birçok köklü uygarlığın ve halkın gelip geçtiği kültür ve uygarlık beşikleridir. Tüm bu halklar, kültürler ve uygarlıklar birbirlerine karışarak, birbirlerine eklemlenerek ve birbirlerini etkileyip dönüştürerek bugünlere geldiler. Bu halkların bir bölümü, süreç içerisinde diğer halklara karışarak yeni bir kimlikle yaşamaya devam ederken, bir bölümü tümüyle yokolup gitti. Bunlara bugün, arkaik halklar ve kültürler deniyor.

Ancak, özellikle güçlü uygarlıkların, dillerin ve kültürlerin, günümüze miras olarak bir kültür birikimi ve mozayiği bıraktıkları açıktır. Bir piramit örneğinde olduğu gibi, sonraki kültürler öncekilerden etkilenerek yükselmeye devam edegeldi. İşte, bu uygarlıkların varislerinden biri olarak bu mozayiğe katkı sunan en kadim ve önemli halklardan biri de Kürtler'dir. Dolayısıyla, eski Mezopotamya ve Anadolu şiirinin halkalarından birisi olması da son derece doğaldı.

Bir görüşe göre, en eski edebiyat türü şiirdir. Düzyazılı anlatı türü ondan sonra doğmuştur. Tahmin edildiği gibi, insanlar çok eski zamanlardan beri şiir söyledikleri halde, bunları çok sonraları yazıya geçirebilmişlerdir. Bir başka söyleyişle eski ozanlar şiir yazmaz, söylerlerdi. Bu gelenek âşıklar açısından bugün bile geçerlidir.

Eski uygarlıkların şiirleri, dünyanın gelişmiş ülkelerinde çeşitli antolojilere konu olduğu gibi; 1974'ten başlayarak Türkiye'de de kimi kitaplara konu olur. (Bkz. T. S. Halman: **Eski Uygarlıkların Şiirleri,** İst. 1974). Bu şiirler Mezopotamya'dan başlayarak eski Yunan, Çin, Hint, Arap yarımadası, Afrika, Orta ve Güney Amerika ve Asya üzerinden Pasifik'e kadar uzanıyor.

### İslâm Öncesi Türk Şiiri

*Hemen belirtelim ki, İslam öncesi Türk şiiri ile amaçlanan, MS. 6. yüzyılda İslamın doğuşundan önceki şiir değil; Türkler'in İslâm'ın etkisine girmeden önceki en eski dönemdir. Prof. Dr. Reşit*

*Rahmeti Arat'tan sonra, eski Türk şiiri üstüne başlıca çalışmaları yapan Prof. Dr. Talat Tekin, bu dönemi şöyle özetliyor:*

*„Türk şiirinin en eski dönemi, pek de uygun olmamakla birlikte,* (**İslâm öncesi Türk şiiri**) *olarak adlandırılabilir. Bu dönemin, teorik olarak, başlangıçtan XI.yüzyıla kadar sürmüş olduğu düşünülebilir ise de, Türk şiirinin bize kadar gelebilen en eski örneklerinin VIII. yüzyıldan kalma olduğu gözönünde tutulursa, İslâm öncesi Türk şiirinin VIII- XI. yüzyıllar arasındaki dönemi kapsadığı söylenebilir. İslâm öncesi Türk şiir geleneğinin Doğu Türkistan'daki Budist Uygurlar arasında XIII. yüzyıl sonlarına kadar devam etmiş olduğu dikkate alınırsa, bu dönemi, VIII-XIII. yüzyıllar arası, yani aşağı yukarı altı yüz yıllık bir dönem olarak kabul etmek gerekir."* (Prof. Dr. T. Tekin: **İslâm Öncesi Türk Şiiri,** Türk Dili Dergisi, Ocak- 1986, s. 3)

Bilinen ilk yazılı Türkçe ürünler, Batılı şarkıyatçılar tarafından bulunup okunan 8. yüzyıla ait Orhon ve Yenisey yazıtlarıdır. Bazı doğubilimciler, eski Türk hükümdarları adına dikilen bu yazıtlardaki metinleri şiirsel örnek olarak nitelendirse de, çoğu bilim adamları bu metinleri düz anlatı eserleri olarak kabul etmektedir. (Bu yazıtları bulup okuyanların tümü Batılı bilimadamları olduğu halde, son zamanlarda MHP tandanslı bazı çevreler, Kürtler'in bir Türk boyu olduğunu savunabilmekte ve buna kanıt olarak da Yenisey anıtlarında *„ Kürt el hanı Alp Urungu"* diye bir ibare geçtiğini söylemektedirler. Oysa, bu ibarenin doğrusu *„ Körtle Han Alp Urungu"* şeklindedir ve „körtle", „güzel" anlamındadır. Görüldüğü gibi, bir gerçeğin reddi için bilimsel veriler bile saptırılabilmektedir…)

Bilindiği gibi, İslâm öncesi Türk şiirinin bugüne kadar gelen en eski örnekleri, sözlü halk şiiri örnekleri olup, - XI. yüzyılda ve daha sonra yazıya geçirilmiş ürünler hariç tutulursa-, Doğu Türkistan'da *Maniheist ve Budist Uygur* kültür çevrelerinde yaratılmış eserlerdir. Bunların en eskileri de Maniheist kültür çevresinde yaratılmış olanlardır. *„Uygurlar, Maniheizmi Doğu Türkistan'a gelip yerleşmeden çok önce, daha Moğolistan'da iken kabul etmiş bulunuyorlardı. Moğolistan'daki Uygur devletinin (744-840) üçüncü hükümdarı* **Bögü Kağan** *(759-779) Mani dinini, 762 yılında kabul etmiş ve* **Maniheizm Uygurlar arasında kısa zamanda yayılmıştı.** *Maniheizmin devlet dini olarak kabul edildiği tarihle, Uygurların Kırgızların baskısı ile Doğu Türkistan'a göç ettikleri 840 tarihi arasında aşağı yukarı 80 yıllık uzunca bir süre vardır. Bu süre içinde, onların arasında Maniheist bir edebiyatın oluşup gelişmeye başladığını düşünmek hiç de yanlış olmaz."* (agy,s. 8)

Mani ve uygur alfabeleri ile yazılmış bu ürünlerin önemli bir bölümünün Soğdca'dan ve öbür İran dillerinden çevrilmiş dini metinler, tövbe duaları ve hikâyelerden oluştuğunu belirtelim. Maniheist Uygurlar'dan kalma bu metinler içinde sekiz de şiir bulunmaktadır ki, bunlar ağırlıkla Maniheizme ve kurucusu Mani'ye övgü niteliğindedir.

Bu dönem şiirsel ürünlerinin kime ait olduğu genellikle bilinmemektedir. Bilinen en eski Türk şairlerden ikisi **Çuçu** ve **Aprin Çor Tigin** adlı Maniheist şairlerdir. **Kül Tarkan, Asıg Tutung, Kacım Keyşi** gibi şairlerin de, Turfan kazılarında çıkan metinlerde adları geçmekte, ancak şiirleri bilinmemektedir. Uygurlar'dan kalma şiirlerde, Maniheizmi ve Budizmi öğreten didaktik şiirler egemendir.

**Karahanlı dönemi Türk şiiri**' ne gelince…Karahanlı Devleti (840-1212) ilk Müslüman Türk devletidir. Esas kitlesini Karluk, Çiğil ve Yağma Türklerinin oluşturduğu Karahanlılar önce Orta Asya'da, 999'dan sonra da Harezm'de egemen olmuşlardır. Doğu Karahanlı sülalesinden Satuk Buğra Han (ölümü 955), 10. yüzyıl başlarında İslâm dinini kabul etmişti. Ölümünden hemen sonra kalabalık bir Türk zümresi İslâm dinine girdi.

Karahanlılar'ın asıl merkezi Doğu Türkistan'daki Kâşgar şehriydi.

Karahanlılar'ın 10. yüzyıl ortalarında tamamıyla Müslüman olmalarından sonra Kâşgar'ın önemli bir Türk- İslâm kültür merkezi durumuna geldiği anlaşılıyor.

İslâmî Türk edebiyatının ilk eserleri de 11. yüzyıl ortalarında Kâşgar'da yazılmıştır. Bunların başlıcaları, Balasağun'lu **Yusuf Has Hacib**' in 1069 yılında tamamladığı **Kutadgu Bilig** adlı 6500 beyitlik büyük manzum eseri ile, onun çağdaşı büyük Türk dilcisi **Kâşgar'lı Mahmud**' un ***Divanü Lügati't- Türk*** adlı Türkçe- Arapça sözlüğüdür. **Edib Ahmed Yüknekî**' nin **Atabetü'l-Hakâyik** adlı yaklaşık 500 dizelik dinî-ahlakî küçük manzum eseri de, büyük bir ihtimalle 12. yüzyıl sonları ile 13. yüzyıl başlarında yazılmıştır.

Karahanlı dönemi Türk şiirinin en büyük temsilcisi Yusuf Has Hacib'dir. Ünlü eseri Kutadgu Bilig'i, 1069/70'de Karahanlı hükümdarı Buğra Han'a sunar. Onu çok beğenen hükümdar, kendisini *Has Hacib* yani *Baş Mabeyinci* yaparak yanına alır.

Yusuf Has Hacib, büyük İran şairi **Firdevsî**' nin daha önce (1010 yılında) yazmış olduğu ***Şehnâme'*** sini örnek almış ve onu Türkçe'ye uyarlamak istemiştir. Bu uyarlamaya rağmen Kutadgu Bilig, 900 yıllık geçmişi olan İslamî-Türk edebiyatının ilk en büyük ürünü sayılmaktadır.

Karahanlı dönemi Türk şiiri iki kolda gelişiyor: *1- Halk Şiiri, 2- Aydın zümre şiiri.* Halk şiiri daha çok İslâm etkisi dışında kalırken, aydın zümre şiiri İslâmî şiirin etkisinde kalır.

Bugün elimizde bulunan en eski Türk Halk Şiiri örnekleri, - ki bunlar daha çok *İslâm Öncesi'* ne tekabul etmektedir- Kâşgarlı Mahmud'un ***Divanü Lügati't- Türk*** adlı sözlüğünde bulunmakta ve bu yolla günümüze ulaşmaktadır. Türkçe- Arapça bir sözlük olan eserde yazar, kimi kelime ve kavramları açıklamak için eski şiir örneklerine yer vermektedir. Bunlar, ya belleğinde tuttuğu ya da not ettiği şiir örnekleridir.

Türk dilinin ve kültürünün temelini oluşturan ve 20. yüzyıl başlarına kadar bilinmeyen bu önemli eser, Diyarbakırlı ünlü kitabiyat bilgini **Ali Emiri Efendi** tarafından bulunup, Türk dünyasına armağan edilmiştir. ( Türk dilinin ve şiirinin temelini oluşturan bu eserdeki şiirsel ürünler, Prof. Dr. Talat Tekin tarafından **XI. Yüzyıl Türk Şiiri/ Divanü Lügati't-Türk'teki Manzum Parçalar** adıyla kitap olarak yayımlanmıştır. Ank. 1989).

Tüm bunlar arasında, Uygurca Buda övgüleri içinde Maytri (Sanskritçe Maitreya) yani „gelecek Buda" için yazılmış beş dörtlükten oluşan bir şiirin tek dörtlüğünü birlikte izleyelim:

***Tört sloklug nom üzre***
***Tutçi öger men üzüksüz***
***Tüş birip munı teg buyanı***
***Tuşayın sizinge Maytri***

***T ü r k ç e s i :***
*Dört kıtalı öğreti ile*
*Durmadan överim aralıksız;*
*Karşılık verip böyle bir sevabı*
*Kavuşayım size, Maytri!*

Karahanlı dönemi Türk şiirinden bir aşk şiiri ise şöyle:

***Yelwin anıng közi***
***Yelkin anıng özi***
***Tolun ayın yüzi***
***Yardı mening yürek***

***T ü r k ç e A ç ı k l a m a :***
*Onun gözleri büyüleyicidir (âşıklarını onlarla avlar)*
*Kendisi (böylece gönlümün) konuğu (oldu)*
*Onun yüzü dolunay gibidir;*
*(Güzelliği ile) beni kalbimden vurdu ve yaraladı!*

Sözkonusu Divan'da yer alan en eski Türk şiiri örneklerinden biri de ***Alp Er Tonga Ağıtı'*** dır. Ders kitaplarına da girmiş olan bir dörtlüğünü birlikte izleyelim:

***Alp Er Tonga öldi mü***
***İsiz ajun kaldı mı***
***Ödlek öçin aldı mı***
***Emdi yürek yırtılur***

***G ü n ü m ü z T ü r k ç e s i y l e :***

*Alp Er Tonga öldü mü?*
*Kötü dünya kaldı mı?*
*Felek (böylece) öcünü aldı mı?*
*Şimdi yürek (ler onun ölümünün acısıyla) paralanıyor.*

İslâm öncesi ve İslâma geçiş dönemi Türk şiirine ilişkin değerlendirmemizi, bir alıntıyla tamamlamak istiyoruz: *„Türkler Şamanlıktan sonra, farklı yer ve dönemlerde Budizm, Taoizm, Manişesizm, Hıristiyanlık ve Hazar İmparatorluğu'nda topluca Yahudiliği benimsedikleri gibi, İslâm çağında kurdukları devletlerde de, etkilenip etkiledikleri başka dinlerle birlikte yaşadılar"* (Gündüz Vassaf: **21. Yüzyılda Din,** Radikal, 7.10.2007).

İslâm Öncesi Türk Şiiri eksenli bu genel girişten sonra, şimdi Mezopotamya ve Anadolu Aleviliği açısından büyük önem taşıyan *Yaresan- Aleviliği'* nin Kürt Şiirindeki yansımasına geçebiliriz.

**Eski Kürt Şiirinde Yarsanizm (Alevilik)**
Literatürde bilinen en eski Kürt şiiri, Milattan Önce 4. yüzyıla aittir. İngiliz arkeologların 19. yüzyılda İran Kürdistanı'nın Hewraman bölgesinde buldukları bir mezar taşı üstüne işlenmiştir. Londra'da bir müzede korunduğu belirtilen şiirin yer aldığı mezar taşının, şiirin sahibi **Borazboz** adlı, bilinen ilk Kürt şairine ait olduğu söyenmektedir. Yaşayan pek az dilde bu kadar eski bir şiire rastlanmaktadır. Çünkü şiir, MÖ 330 yılına tarihlendirilmektedir. Borazboz'un, şiiri karısına ya da sevgilisine yazdığı anlaşılmaktadır. Bugün bile büyük ölçüde anlaşılabilen şiir Kurmanci lehçesinden *„Xwazdî ez tu bi hevre bin/ Bi hevre herin xorînê"* sözleriyle başlamaktadır. Şiirin Türkçe çevirisi şöyledir:

*Birlikte geçen günleri özlüyorum*
*Hele sabah çıkıp gidişimizi*

*Seninle dağlara çıkar, dolaşırdık*
*Birlikte söylerdik türkülerimizi*

*Ben o dağların ruhundan öğrenmiştim*
*Ta yürekten, candan, içli söylemeyi*

*Hem dağlarda, hem kırlar, hem sahralarda*
*El aman, medet aşkın elinden yani*

*İkimiz tam da tek bir gönül olmuşken*
*Sonbahar gelip böyle, ayırdı bizi*

*Ancak birlikte olunca küflenmez aşk*
*Ya bağır bir ses ver, ya da uyu hadi.*

(Bkz. Selim Temo: **Bilinen En Eski Kürt Şairi Borazboz,** Esmer Dergisi, Sayı: 8/ 2005)

Bundan sonra bilinen en eski Kürt şairi MS 5. yüzyılda Bağdat'ta yaşadığı bilinen **Nuşirvan** adlı bir şairdir. Bu da, eski Türk şairlerinden **Çuçu** gibi ismi bilinip, eserleri elde edilemeyen bir şairdir. Kürt şiirinde bilinen diğer örneklerse, İslâmiyetin doğuşundan sonra, ancak bu dinin etkisine girmeden önce yaratılan ürünlerdir. Bu eserlere, İslâm öncesi Kürt şiiri diyoruz.

Kürtler'in eski dinlerinden Zerdüştiliğe mensup olduğu anlaşılan bir şairce 7. yüzyılda ceylan derisi üzerine Hewrami (Gorani) lehçesiyle yazılan bir şiir, dini temalı en eski şiirlerden biridir. Bu şiirde, İslâm Halife ordularının Zerdüşti topluluklara karşı yaptığı katliam anlatılmakta ve lânetlenmektedir. Şiirin Türkçesi şöyle:

*Kutsal yerler yakıldı, kutsal ateşler söndü*
*Herkesten saklandı namlı büyükler*
*Zalim Araplar girdi ta Fırat'a dek*
*Köylerden tut da ta Şehrizur'a kadar*
*Esir alındı bütün kızlar ve kadınlar*
*Kendi kanında boğuldu özgür adamlar*
*Kimsesiz kaldı Zerdüşt'ün töresi, dini*
*Yüce Hürmüz affetmeyecek hiç birini.*

VII-X. Yüzyıllar arası Kürt tarihi üstüne bir doktora çalışması yapan **Dr. Arşak Poladyan,** Kürtler'in geçmişte bağlı bulundukları Zerdüştilik ile onun güçlü ve yenilikçi devamı niteliğindeki **Mazdekçilik** ve **Hurremiliğin;** İslâmiyetin kurumsal etkisine girmeden önce bu topluluklar üzerindeki etkisini şöyle yansıtıyor:

*„Abbasiler döneminde İslâm karşıtı oluşumların temel hareket gücünü toprak eşitliğini savunan köylüler oluşturmuştur. (…)VIII-IX. yüzyıllarda çeşitli İran vilayetlerinde gelişen din grupları ile İslâmiyet dönemindeki Mazdeki hareketi de bu slogandan yararlanmıştır.(…) IX. yüzyıldan başlayarak Hürremizm, köylü hareketleri ideolojisinin temel formuna dönüşmüştür. Hürremizm, Manihey- Mazdekit tipindeki öğretilere yakın bir ideolojiyi temsil etmektedir. Hürremiler ‚Muhammira' (Kızıllar, Kızılbayraklılar) adıyla bilinmektedir. (…) Onlar, dünya düzenindeki adaletsizliğin kökünü toprak ve sosyal eşitsizlikte görmekteydiler. İşlenebilen bütün toprakları toplumsal mülkiyete dönüştürmek, özgür köy toplumlarının yönetimine bırakmak istemektedirler. Hürremiler, aralarında kadınların da olduğu genel eşitliği, vergilerden ve haraçlardan kurtulmayı istemekteydiler. Baskı ve sosyal eşitsizliğin (karanlığı) oluşturduğunu kabul eden Hürremiler, gerek Arap hanedanlığına gerekse İslâmiyete karşı uzlaşmaz bir mücadele yürütmüşlerdir."* (Dr. Arşak Poladyan: **VII- X. Yüzyıllarda Kürtler,** Özge yay. Ank. 1991,s. 44)

*Burada anlatılan dinsel, inançsal, kültürel ve ideolojik yapılanma kuşkusuz edebiyatın diline, üslubuna ve içeriğine de yansıyacaktır. Nitekim, Kürt şairleri de İslâmiyetin etkisine girmeden önce kendi özgün dilleriyle yazarken; Arapça'nın din ve kültür dili olmasından sonra Arapçaya, daha sonraysa Farsçaya yönelmişlerdir. (***Melik Şarayê Bihar**' *ın, İslâmiyetten sonra Fars dilinde ilk şiir yazan Kürt şairi olduğu söylenir. Fars edebiyatının temellerini atan en büyük şairlerden biri kabul edilen, 1140-1202 yılları arasında yaşayan* **Nizamî-i Gencevî**' *nin de Kürt kökenli olduğu biliniyor). Bu özelliği; önce Zerdüştî, daha sonraysa Mazdekçi, Hürremi ve Yarsanî şairlerde rahatlıkla gözlemleyebiliyoruz.*

Göreceli olarak coğrafik ve kültürel açıdan İslâmiyetin etkisinden uzak kalabilen **Yarsancı Goran şairler**'de bu özelliği daha iyi izleyebiliyoruz. Özellikle Yaresan Edebiyatı üstüne önemli çalışmalar yapan Maruf Haznedar'ın dediği gibi, **Yarsancı Goranlar, inançlarının Zerdüştîliğe bağlanması nedeniyle, Arapça yerine Kürtçe düşünmüş ve Kürtçe yazıp konuşmuşlardır.** Yarsan dininin şiire aktarılması bu edebiyatın oluşumunda önemli bir rol oynar.

Maruf Haznedar'ın, **„Kürt edebiyatı Gorani lehçesi ve Ehl-i Hakka** (Yarsanizm) **dayanır**" yolundaki tespiti, bu açıdan önemlidir.

Kürt şiiri üstüne önemli bir antoloji çalışması hazırlayan genç ve yetenekli araştırmacı **Selim Temo**' nun, şiir örneklerinden yola çıkarak yaptığı şu belirleme de konumuz açısından son derece önemlidir:

*„Yarsancıların aynı zamanda şair de olan pîr ve ulularıi, Kürtçe düşünüyor ve Kürtçe yazıyorlardı. Dinlerinin inanç ve esaslarını halk şarkısı formunda şiirlerle anlatıyorlardı. 8. yüzyıldan 20. yüzyıla kadar varlığını sürdüren bu şiirleri, aynı zamanda kayıt altına da alındıkları için Kürt yazılı edebiyatının en önemli kaynakları saymak mümkündür."* (Selim Temo: **Kürt Şiiri Antolojisi,** 2 Cilt, Agora yay. İst. 2007)

Tıpkı daha sonra Yezidiler'in kutsal kitaplarında olduğu gibi, bu eserlerin gizlilik dereceli bir yazıyla ve özel şifrelerle yazılması, belki de İslâm tasallutundan kurtulmalarını ve bugüne ulaşmalarını sağlamıştır.

Adıyla anıldıkları şairlerin ya da dönemin diğer şairlerinin şiirlerini kapsayan bu eserlerin bazıları şunlardır: ***Serencam, Dewrey Balûl, Defterî Pîrdîwerî, Defterî Dîwanî Gewre, Dîwanî Sawa, Defterî Ramyaw, Defterî Zulal Zulal, Defterî Gewayî Xulaman, Defterî Şindirwe, Defterî Abidinî Caf, Kelamî Almas Xan, Kelamî Derşêş Kulî Kirindî, Dewrey Qirmîzî, Kelamî Zulfikar, Dîwanî Şa Teymûr Banî Yaranî,***

***Dîwanî Kasîd, Dîwanî Şah Amîr, Kelamî Newroz.****(Bkz. Age).*

Bunlardan ***Serencam, Defterî Pirdiwerî***, ***Defterî Diwanî Gewre*** ve Balûlî Dana'nın şiir ve hikmetli sözlerini kapsayan ***Dewrey Balûl*** adlı eseriyle, sonradan oluşturulan ***Zebûrê Haqiqat*** adlı kutsal kitap, Yarsanizm dininin temel kaynaklarını oluşturuyor.

## Yarsanizm'in (Ehl-i Hak) Kuramcısı Balûlî Dana (Behlül-i Dânâ)

İslamiyetin doğuşundan sonra, islamdışı şiir yazan ve günümüzde **Alevilik** formuna dönüşen **Yarsanizm**' in kurucusu kabul edilen 8. yüzyılda yaşamış (ölümü 837) Kürt şairi **Balûlî Dana** hakkında Türk literatüründe verilen bilgiler, sözkonusu çevrelerin bilgilerini yenibaştan sorgulamasını gerektirecek niteliktedir.

Kürt literatüründe, üstteki adın yanısıra „Medli“ anlamında **Behlûlî Madî** (**Mahî**) adıyla da bilinen bu Kürt şairi, 8. yüzyılın ikinci yarısında Luristan'ın Mahilkûfe bölgesinde doğar. Özellikle Goranî ve Luri lehçesinde şiirler yazar. Kendisinden sonra birçok Kürt şairi onun yolunu izleyerek, önemli bir edebiyat akımı yaratırlar. Bu edebiyat akımı içinde , erkeklerin yanısıra birçok kadın şair de yetişmiştir. Dini literatürde *Yarsan, Yaresan, Ali- Allah, Ali- İlahî, Yarsanizm, Ehl-i Hak, Ahlê Haq* gibi isimlerle anılan bu inanç; günümüz Aleviliğinin temel kaynaklarındandır. ( Alevilik'le Ehl-i Haklık arasında benzer çizgiler konusunda bkz. M. Bayrak: **Alevilik ve Kürtler,** Özge yay. Ank. 1997).

Abdülbaki Gölpınarlı gibi Bektaşilik ve Tasavvuf araştırmaları yapan bir akademisyen şu bilgiyi veriyor: *„Gayet nükteli sözler söyleyen bir meczup. Abbasoğulları'ndan Harunürreşid'in kardeşi olduğu söylenir.“* (Bkz. **Alevi- Bektaşi Nefesleri,** 2. bas. İst. 1992,s. 381).

Diğer ansiklopedilerdeyse, özetle şu bilgiler verilir:

*„İran ve Türk edebiyatında bilgece sözlerinden dolayı* **Behlûl-i Dânâ** (**Bilgin Behlûl**) *adıyla da anılan Kûfe'li bir sufinin adıdır. Harun Reşit döneminde (786-809) yaşadığı, yaşamının büyük bir bölümünü Bağdat'ta geçirdiği biliniyor. Ondan söz eden fıkralarda yarı deli sokaklarda dolaştığı, dünya nimetlerine önem vermeden ve hırsa kapıldıkları için insanlardan uzaklaşarak Tanrıya yöneldiği anlatılır. Tasavvufla ilgili yapıtlarda yer alan bu fıkralar* ***Feridüddin Attar*** *tarafından genişletilerek öyküleştirilmiştir. Edebiyatımızda da bu yönüyle sözü edilir. Tanrı aşkıyla her şeyi terkettiği için deli sayılan ama gerçekte akıllı bir hak âşığı, bir bilge olarak görülmüştür.“* (Bkz. A. Özkırımlı: **Türk Edebiyatı Ans.** Cilt-1, Cem yay. İst. 1982,s. 209).

*Türk Ansiklopedisi, Meydan Larousse, Büyük Larousse, Ana Britannica* gibi diğer Türkçe ansiklopedilerde de benzeri bilgiler tekrarlanır. Yalnızca sonradan yayıldığı Anadolu ve Azerbaycan'la ilişkilendirilip, „Kürt" kimliğine hiç bir vurgu yapılmayan bu filozof- şairin, *Behlül Dâne, Behlül Divane, Pehlül Bir Dane, Behlûl Dânende* gibi adlarla anıldığı ve bilge kişiliğinden dolayı büyük bir yaygınlık kazandığı belirtilmekle yetinilir.

Hatta, Yunus Emre'nin *„Halife oldum bindim çok türlü hâle döndüm/* ***Behlûl*** *ile sinlerde ol kelle kıran benem"* sözlerinden habersiz, onun 16/17. yüzyıllarda yaşamış olduğunu söyleyenler de bulunabilmektedir. (Bkz. İ. Özmen: **Alevi- Bektaşi Şiirleri Ant.**).

Bu filozof- şairin şiirinden iki beyti birlikte izleyelim:

***Ew watey yaran, ew watey yaran***
***Ême dêwaneyîn ew watey yaran***

***Henî megêlin yek yek şaran***
***Ta zinde kerim ayîn Îran***

Türkçe Sö yleyişiyle:
*Bazı yârlara (yaresanlara) göre, bazı yârlara göre*
*Divane olmalıymışız o yârlara göre*

*Ama dolaşıyorlar tek tek şehirleri*
*Diriltmek için eski İran dinini*

**Kadın ve Erkek Yaresan/ Alevi Şairler ve Âşıklar**

Bugün Kürt şiirinde, Balulî Dana'yı izleyerek sonraki yüzyıllara sarkan onlarca erkek ve kadın Yaresan şairi ve âşığı biliniyor. Bu erkek şair ve âşıklar; Kürtçe'nin yanısıra Farsça, Türkçe, Rusça ve Romen dillerine de yansıyan ve dinsel bir mansıp olan ***„Babe/ Baba"*** unvanıyla anılmaktadırlar. Bilindiği gibi ***„Bab"***, Alevilikte de ***„Kapı"*** anlamında bir kutsallık ifade etmekte ve Kalenderilik, Haydarilik , Bektaşilikte bir dini unvan olmaktadır. Anadolu'daki ilk Alevi önderlerinin *Baba İlyas, Baba İshak* gibi şahsiyetler olduğu ve bunların önayak olduğu 13. yüzyıl isyanının da *Babaî Hareketi* olarak adlandırıldığı unutulmamalıdır.

Önce, hemen tamamı (Babe/Baba) unvanlı olup, elimizde eserleri bulunan erkek şair ve âşıklarla, yaşadıkları dönemlere göz atalım:

**Babe Raxê Hemzanî** (8/9. yüzyıl)
**Babe Hatemê Loristanî** (8/9. yüzyıl)
**Babe Lorey Loristanî** (8/9. yüzyıl)
**Babe Nicumê Loristanî** (8/9. yüzyıl)
**Babe Recebê Loristanî** (8/9. yüzyıl)
**Baba Serhengî Dewdanî** (935- 1007)
**Baba Tahirê Uryan** (938 ? – 1010/ 1020 ?)
**Evdılsemedê Babek** (972- 1019)
**Babe Gerçekê Hewramî** (10. yüzyıl)
**Babe Sırıncê Kelatî** (10. yüzyıl)

**Pîr Şalyar** (1006- 1098)
**Elî Herirî** (1010- 1078)
**Şa Xweşinê Loristanî** (1016- 1077)
**Şêx Adî** (1073- 1162)
**Babe Nawsî Caf** (1084- 1161)
**Abidinî Caf** (1320- 1394)
**Baba Yadigâr** (1359- 1480)
**Qırmızî- Şaweys Qûlî** (1407- 1514)
**Alî Qelender** (1434- 1484)
**Seyid Ekabîrî Xamoşî** (1440- 1493)
**Babe Celilî Dewdanî** (1578- 1560)

*Burada anılanlar, Yaresan- Aleviliği doğrultusunda Kürtçe şiirsel üretim yapıp, bir bölümü de saz eşliğinde bunları icra eden şair ve âşıklardır. Kürt kökenli olup, Osmanlıca, Farsça ve Arapça gibi üç dilde önemli divanları bulunan Alevi edebiyatının en büyük temsilcilerinden büyük divan şairi* **Fuzulî** *gibi önemli temsilciler burada anılmamaktadır. Aynı dönemde yaşamış ve büyük bölümü eserlerini sazla terennüm eden kadın şair ve âşıkları ise şöyle sıralayabiliriz:*

**Celale Xanıma Lorıstanî** *(985- 11. yüzyıl)*
**Daye Tewrêza Hewramî** *(10/11 yüzyıl)*
**Rıhan Xanıma Lorıstanî** *(11. yüzyıl)*
**Lıza Xanım** *(11. yüzyıl)*
**Xatû Mey Zerd** *(11. yüzyıl)*
**Daye Xezana Serketî** *(11. yüzyıl)*
**Fatıme Loreya Goranî** *(11. yüzyıl)*
**Yay Hebîbeya Şarezurî** *(1282- 1348)*
**Nazdar Xatûna Şirazî** *(13. yüzyıl- 1363)*
**Xatûn Dayrakî Razbar** *(13. yüzyıl- 1345)*
**Nergiz Xanıma Şarezûrî** *(1301- 14. yüzyıl)*
**Xatun Zerbanûya Derzyanî** *(14. yüzyıl- 1440)*
**Semen Xanıma Devdanî** *(16. yüzyıl)*

*Tüm burada anılan şair ve âşıkları tek tek irdelemenin yeri burası değil. Ancak şu kadarını belirtmeliyim ki; 10/11. yüzyıllarda yaşamış olan* **Baba Tahir Uryan,** *ünlü İranlı şair* **Ömer Hayyam** *ile Türk şairleri* **Yunus Emre** *ile* **Mevlana'** *nın düşünce babası ve şiirsel öncüsü konumundadır. Zaten, kendisi „Kürtler'in Ömer Hayyam'ı" olarak da nitelendirilmektedir. Onlara önderlik yapmasına ve adına Balkanlar'da bile dergâhlar bulunmasına rağmen, bu büyük filozof-şair, Türkçe tasavvuf literatüründe adeta görmezden gelinmiştir.*

*Yaresan/ Alevi edebiyatında yer alan üstteki kadın şairler de, bu inancın ve kültürün kutsal kişilikleri arasındadır. Bunlardan 13/14. yüzyıllarda yaşamış olan* **Xatun Dayrakî Razbar'** *ın***,** *Ehl-i Hak dininde Hakk'ın tecellilerinden biri kabul edilen ve bazı yönleriyle* **Hacı Bektaş-ı Veli** *ile benzeştirilen* **Sultan İshak (Sultan Sohak)** *ın anası olduğu söylenir. Bilindiği gibi, günümüzde Razbar adıyla bir Ehl-i Hak müzik topluluğu bulunmaktadır.*

*Aslında, İslami öğretilere bağlı Kürt topluluklarıyla; Alevi, Ehl-i Hak ve*

*Yezidî gibi İslamdışı öğretilere bağlı Kürt toplulukları arasında kadının konumu açısından belirgin farklar vardır. Bunu, İslamiyet'ten önceki Kürt toplumu ile İslamiyet sonrası Kürt toplumunu karşılaştırdığımızda da rahatlıkla görüyoruz.*

*Sözgelimi Kürtler'in geçmişte bağlı bulunduğu Zerdüşt düşüncesi ile onun güçlü ve yenilikçi devamı niteliğindeki Mazdekçilik öğretilerinde, kadın- erkek eşitliğini esas alan bir anlayış vardı. Hatta Mazdek öldürüldükten sonra karısı* **Hurreme,** *onun yerine geçerek düşüncelerini yaymaya devam ediyor. Peşine takılanlara* ***Hurremdin*** *adı veriliyor. Hurremdinliler, İran- Kürdistan- Mezopotamya bölgelerinde geniş alanlara dağılarak bu öğretiyi yayıyorlar. Bugünkü Alevilik, Ehl-i Haklık ve Yezidilik'e damgasını vuran birçok düşünce, kaynağını, onun kuramcısı ve isim-anası olduğu* ***Hurremilik'*** *ten alıyor.*

*Kızılbaş/Alevi, Ehl-i Hak ve Yezidî Kürt topluluklarında, dini töre ve törenler kadın ve erkeklerle birlikte yapılır. Alevi ve Ehl-i Hak gibi „melek kültü"ne bağlı topluluklarda, kadının önemli bir rolü vardır. Bu öğretilerde, toplumu yönettiğine inanılan Kırklar Meclisi'nin (Çihiltan) 40 üyesinden 17'si kadındır. Öte yandan, 20. yüzyıl başlarında faaliyet gösteren dini lider* **Nimetullah Ceyhunabadî'** *nin beraberindeki 1145 sûfî'nin yaklaşık 500'ü kadın olduğu gibi; Ehl-i Hak (Yarsanizm) dininin kutsal metinlerinden bazıları da* **Mama Nergiz Şahrazurî** *gibi kadınlarca yazılmıştır.*

*Yaresan Aleviliği'nin kadın dini önderleri ve âşıkları olarak nitelendirdiğimiz yukardaki kadın sanatçılardan* **Celale Xanıma Lorıstanî, Rıhan Xanıma Lorıstanî, Lıza Xanım, Xatun Dayrakî Razbar, Xatûn Zerbanûya Derzyanî** *gibilerinin, eserlerini dergâh ve cemhanelerde saz eşliğinde icra ettikleri bilinmektedir. Elimizde, tümünden örnekler bulunmakla birlikte, biz, yalnızca 11. yüzyıl âşık- şairlerinden* **Lıza Xanım'** *dan, Yarsanizm'den Aleviliğe evrilmeyi/ geçişi gösteren ve iki öğretide de gizliliği esas alan bir dörtlükle sözlerimizi noktalamak istiyoruz:*

***Heyder nazkêş, Heyder nazkêş***
***Ne hizur şapame ne niyer we pêş***
***Qebaley sirên bikere endêş***
***Ba neza nopêş bêgane û xwêş***

***T ürkçesiyle:***

*Ey halden anlayan Haydar, ey Haydar (x)*
*Ne huzurum kaldı, ne takat, ne fer*
*Öğretiyi düşün, o en gizli sır*
*Asla anlamamalı kayıtsız cahiller...*

(x) **Haydar:** İmam Ali'nin adlarından biri.

TÊBÎNÎYEKE PÊWÎST

Du sal berîya nuha Weşanxaneya APECÊê însîyatîfa durustkirina PEYMANÊN BINGEHÎN wergirt û xwest weke pêşnîyar di weşangerîya kurdî de jî bibe prensîb. Ev Peymanên Bingehîn tenê weke krokî ne û gelek prensîbên hêja destnîşan dikin. PEYMANÊN BINGEHÎN weke broşur hatîye çapkirin. Lê bi destûra Weşanxaneya APECê me xwest em vî karê hêja WEKE XWE di vê hejmara kovara xwe de biwşînin.

# PEYMANA MAFÊ TELÎFÊ
# -copyright-

Ev kar û xebata **Peymanên Bingehîn û Peymanên weşangerîyê** li ser daxwaz û pêşniyara weşanxaneya APECê, redaksiyona wê amade kiriye. Redaksiyonê li peyman û weşangerîya swêdiyan mêze kiriye û li gor zanebûna xwe, li gor şertên welat û weşanxaneyên kurd xwestiye ku hinek destûr û prensîbên van peymanan bi kêmanî weke reşnivîs derxin û li gor rewşa îro rast û sererast bikin. Ev nimûneyeke reşnivîsa weşangerîyê ye ku APEC pêşnîyarî weşangerîya kurd dike.

Dema ku meriv li weşangerîya kurdî difikire, meriv dibîne ku li gel weşangerîya navnetewî zêde nagunce û hinek kêmasîyên xwe hene.

Bi proje û însîyatîfa weşanxaneya APECê, me li ser weşangerîya Swêdê û hin welatên Awrûpayê lêkolîneke piçûk kir. Li gor evê lêkolînê, me dît ku di navbera Komeleya Nivîskaran, Komeleya Îlustratoran û Komeleya Weşangeran de **Peymanên Bingehîn** hene. Ew peymanên ku weşanxane di navbera xwe û nivîskar, wergêr û îlustratoran de datîne, li gor rê û rêbazên van **Peymanên Bingehîn** in. Lê dema ku meriv li weşangerîya kurdî temaşe dike, di navbera nivîskar, wergêr û îlustratorên kurd û weşanxaneyan de ev rê û rêbaz nîne an jî gelekî lawaz e.

Ji bo pêwîstî û pêdivîya van rê û rêbazên weşangerîyê, me ji van **Peymanên Bingehîn** yên navnetewî ji bo weşanxaneyên kurd reşnivîsek amade kir. Me xwest berpirsên weşanxane û serokên komeleyên nivîskaran vê reşnivîsê bidin ber xwe û li ser bifikirin. Îro nebe jî di pêşeroja weşangerîya kurd de pêwîstî û pêdivîyeke weha dê hebe. Ji ber vê yekê baştir e ku ev prensîb û marîfeta weşangerîyê ji îro ve di nav dezgehên kulturî û weşanxaneyan de were minaqaşekirin.

*Red.*

## MAFÊ TELÎFÊ

(copyright)

Sîstema mafê telîfa ku îro li dunyayê heye xwedîyê dîrokeke kevn e. Bi hunera çapxaneya Johannes Gutenberg dema ku berhem çap û zêde dibin, ev sîstema mafê telîfê jî dibe pirseke rojane û rû dide. Di wan deman de karê weşangerîyê jî çapxaneyê dikir ku jê re digotin: kitêbçapker.
Mafê telîfê cara pêşîn bi peymanekê di navbera Johannes Gutenberg û Johnê Speyerî de li Komara Venedîkê di sala 1469an de hatîye girêdan.

Tekst, îlustrasyon, nexşe, peyker, muzîk, wêne, film, fotograf, programên komputer û her wekî din ew hemû berhemên edebî û hunerî dikevin kategorîya mafê telîfê ku bi destên însan hatine çêkirin.

Herkesê ku berhemeke hunerî û edebî afirandibe û ev berhem di warê xwe de xwedîyê taybetmendîyeke xas û orîjanal be, dibe xwedîyê mafê telîfê. Qest û mebesta ji taybetmendîyeke xas û orîjanal ew e ku berhem serbixwe û şexsî ye, yanî bi hîs, raman û hunera xwedîyê berhemê hatiye afirandin. Weke nimûne: Mem û Zîna Ehmedê Xanî û nameyeke xwendevanekî jî berhemeke xas û orîjînal e. Lê tarîfa xwarinekê nakeve vê kategorîyê. Divê were zanîn ku ji bo orîjînalîya berheman li tu dereke dunyayê pîvanek diyar tuneye.

Mafê telîfê hertim yê afirînêrê berhemê ye û tenê bi afirandina berhemekê bi dest dikeve. Bi gotineke din, ji bo vî mafê telîfê ne pêwîst e ku meriv berhema xwe li dezgeheke fermî û nîvfermî qeyd bike yan jî ji bo vê yekê muracaatî derekê bike. Ji bo parastina mafê telîfa berhema xwe têr dike ku meriv sembola navneteweyîya copyrightê © li gel navê xwe destnîşan bike.
Di roja îro de di qada navnetewî de sê peyman hene ku mafê telîfê diparêzin.
*Peymana Bernê* jî di sala 1886an de hatiye girêdan û heta sala 1997an 127 welatan ew îmze kirine.
*Peymana Dunyayê*, di 1952an de hatiye girêdan û 95 welatan ew îmze kirine.
*Peymana Romayê*, di 1961î de hatiye girêdan û 51 welatan ew îmze kirine.

Ji van hersê peymanên navneteweyî Peymana Bernê ji van herduyên din kevintir, berferehtir û xurtir e. Ev peyman hema hema ji alîyê hemû welatan ve hatiye pejirandin.

Di navaroka vê Peymana Bernê de du mafên bingehîn hene ku:
Jê yek mafê îdeal û yek jî mafê aborî ye. Xisûsîyeta mafê îdeal an jî exlaqî ew e ku afirînêrê

berhemê bi awayekî diyar û vekirî destnîşan dibe ku tenê ew xwedîyê berhemê ye. Herweha li gor vî mafê îdeal dema ku berhem were guhertin, dizîn û deformekirin, an jî bi awayekî nav û îzet-î nefsa xwedîyê berhemê were şikandin, xwedîyê berhemê dikane gilî û protesto bike. Xisûsîyetên mafê aborî jî ew e ku afirînêr ji berhema xwe pereyan qezenc bike. Hatina ku ji berhemê tê beriya hertiştî yê afirînêr e, lê ew dikane vî mafê xwe yê aborî bifroşe.

Welatên ku Peymana Bernê pejirandine, divê qanûnên xwe yên mafê telîfê jî li gor ruhê vê peymanê çêbikin.

Mafê telîfê heta 70 salên piştî mirina afirînêr jî li kar e. Kesên ku naznavan (pseudonym) bi kar tînin û heta mirina xwe nasnameya xwe eşkere nakin, herweha ew jî xwediyê eynî mafî ne.

## PEYMANA BINGEHÎN JI BO NIVÎSKAR

*Ev peyman ji bo nivîskar û weşangeran, di navbera Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran de hatiye girêdan.*

### PRENSÎBÊN GIŞTÎ

Ev peyman û prensîb ji bo weşanger û nivîskaran, di navbera Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran de hatine danîn. Peyman tenê ji bo wan berhemên ku di çarçove û çavdêrîya Komeleya Nivîskaran de ye.
*Weke nimûne*: berhemên, ilm û zanistî, faktayî û kitêbên dersê ne ku di nav çarçoveya vê peymanê de ne.

**Forma peymana weşanxaneyê**
Forma peymana weşanxaneyê divê li gor prensîbên peymana bingehîn be ku ji alîyê Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran ve hatine girêdan. Forma peymana weşanxaneyê divê bi nivîskî be û îmzekirî li ba nivîskar û weşanger hebe.

### ÇAP Û ÇARÇOVEYA PEYMANA WEŞANXANEYÊ

**Destûrdayîna maf**
Bi vê peymanê nivîskar hemû mafên weşandina berhema xwe bi zimanê kurdî dide weşanxaneyê. Hemû mafên din weke yên nivîskar dimînin.

**Çap**
Ku di navbera nivîskar û weşanxaneyê de lihevkirineke din tunebe, mafê weşanxaneyê heye ku biryarê bide çend caran û çend liban çap bike.
Weşanxane divê beriya çapa yekem agahdarîyê bide nivîskar ku ka ew ê çend liban çap bike.

**Di peymana weşanxaneyê de çarçoveya wextê**
Nivîskar û weşanxane ji bo mafê weşandina berhemê li ser dirêjîya wextekê li hev dikin. Li hin welatan ev wext 12 sal in. Heta ku tiştekî awerte rûnede, li gor peymanê ew wexta di navbera nivîskar û weşanxaneyê de her li kar e. Di rewşeke awarte û rabûna peymanê de hemû mafê berhemê li nivîskar an jî warisên wî/wê vedigere.

**Mafê weşanger**

Dema ku peyman hêj li kar be, heta ku nivîskar mafê weşandina berhema xwe ji weşanger bi awayekî bi paş ve nestîne, bi tu awayî nikane berhema xwe bi kurdî weke kitêb biweşîne. Lê ku nivîskar bixwaze beşekê ji kitêba xwe di rojnameyekê de biweşîne divê destûra weşanger hebe.

**Dewrkirina mafê weşanê**

Weşanger bêyî destûra nivîskar nikane mafê weşandina berhemê dewrî weşaxaneyeke din bike, an jî bifroşe.

Dema ku weşanxane îflas bike, mafê weşanger li ser berhemê namîne.

ERK Û BERPIRSÎYARÎYA NIVÎSKAR

**Manuskrîpt**

Ew wexta ku nivîskar û weşanger di peymanê de li ser li hev kirine, divê nivîskar manuskrîpta berhema xwe teslîmê weşanxaneyê bike. Lê ku nivîskar di wê wexta diyarkirî de berhema xwe neyîne, weşanger wexteke nû tayîn dike (li Swêdê ev wext 2 hefte ye). Lê ku dîsa jî berhem ji wexta xwe dereng bikeve, peyman betal dibe.

Dema ku manuskrîpta nivîskar tê teslîmkirin divê bêyî kêmûkurî amadeyî çapê be.

Piştî weşanê divê manuskrîpta nivîskar bi hemû materîyalên xwe li nivîskar vegere.

**Sererastkirin û lêhûrbûna berhemê**

Maf û mesûlîyeta nivîskar e ku li berhema xwe binere û lê hûr bibe. Piştî sererastkirinê, ew guherînên ku nivîskar bike û ji sedî dehê mesrefa mîzampajê zêdetir be, mesrefa çûyî nivîskar dide.

**Guhertinên manuskrîptê**

Piştî ku berhem ji bo çapê hat amadekirin, lê dîsa jî nivîskar bixwaze hin guherînên bingehîn bike ku karakter, kêm û zêdeyîya rûpelan biguhere, wê çaxê divê weşanger jî vê guherînê qebûl bike. Ku ev guherînên dawîn ne bi dilê weşanger bin, ew dikane peymanê betal bike.

**Formdayîna tîpografîyê**

Tîpografî, estetîk, form, berg û di tiştên mîna hilbijartina kalîteya kaxiza berhemê de jî weşanxane xwedîyê gotinê ye, lê bêguman nivîskar jî dikane pêşnîyarên xwe bike.

BI GIŞTÎ ERK Û BERPIRSÎYARÎYA WEŞANGER

**Mecbûrîyetîya weşandinê**

Ku di peymana navbera nivîskar û weşanger de li ser wexteke din lihevkirinek tunebe, divê weşanger berhemê di navbera 18 mehan de biweşîne.

Weşanger divê bi awayekî baş û pêwîst berhemê bigêhîne bazarê: Li hin welatan edet û marîfet ew e ku weşanger berhemê bigêhîne rexnegir, analîtîker, kovar û rojnameyên edebî, medya û hemû dezgehên kitêbfroşîyê.

Ku weşanger di navbera 18 mehan de berhemê neweşîne, an jî di berpirsîyarîyên xwe de sersarîyê bike, peyman betal dibe û mafê nîvîskar heye ku telîfa xwe jî bigire.

ŞERTÊN ABORÎ

**Prensîbên giştî ji bo telîfê**

Telîfa nivîskar divê hertim li ser prosenta firotina kitêbê be. Nivîskar û weşanger li ser vê prosentê li hev dikin.

**Telîfa ji kitêbên firotî**

Nivîskar û weşanger li ser prosenta telîfê li hev dikin û li gor wê lihevhatinê weşanger nîvê pereyên çapa yekem pêşîn dide nivîskar. Ku tu kitêb neyên firtotin jî ev pere mafê niviskar e. Nivîskar telîfa xwe ya mayî jî hersal piştî firotina kitêban ji weşanger werdigre.

**Telîfa ji kitêbên çapkirî**

Ev telîfa ha li gor hejmara kitêbên çapkirî tê hesabkirin. Li gor vê prensîba telîfê, nîvê pereyên nivîskar pêşîn li ser hejmara van kitêban tê dayîn. Li hin welatan ev hejmara çapa yekem divê ne kêmî 8000 liban be.

**Kitêbên ku ji bo nivîskar weke diyarî tên dayîn**

Di her çapeke berhemê de divê weşanger hejmareke kitêb belaş bide nivîskar. Li hin welatan ji çapa yekem 25-35 lib tên dayîn û ji çapên mayîn jî 15-20. Ku nivîskar ji bilî van zêdetir bixwaze, dikane ji xwe re bikire.

DI DERXISTINA BERHEMÊ DE BALEKE PÊWÎST

**Haydarîya ji bo çapeke nû**

Di her çapeke nû de, bi kêmanî salekê berê, divê weşanger nivîskarê berhemê ji vê yekê haydar bike.

**Diyarkirin**

Di her libeke berhemê de divê ev îşareta telîfê © (copyright) hebe. Herwusa jî navê xwedîyê berhemê û sala çapkirinê divê di cîyekî dîyar û vekirî de bê nivîsandin ku xwedîyê berhemê were zanîn.

Ji bilî wan libên ku belaş ji bo nivîskar tên dayîn, an jî ew libên ku li hin welatan ji bo dezgehên fermî tên şandin, divê her libeke berhemê bi bandrol be.

**Lêhûrbûn**

Di lêhûrbûna çapa nû de divê nivîskar û weşanger li ser guherandinên muhtemel bi awayekî li hev bikin.

HESABÊ SALANE

Ji bo ku telîfa nivîskar ji berhemên firotî were zanîn, divê salê carekê hesabek were pêşkêşkirin. Ev wext dikane li gor welatan biguhere, lê li Swêdê di meha 10an de ye.

**Şêweyên hesabê salane**

Di hesabê salane de divê ev tiştên jêrîn hebin:

– agahdarîyeke di derbarê berhemên belavkirî û yên di depoyê de mayî
– agahdarî li ser wan libên berhemên zirardîtî û wendabûyî
– hesabê wan libên ku hatine firotin
– hesabê prosenta telîfa nivîskar
– para nivîskar û kara weşanger divê were dîyarkirin

Û ev hesab divê bi destê muhasibekî û di çarçoveya qanûnî de bibe.

**Mafê nivîskar yê kontrola hesabî**

Weşanger mecbûr e ku heta deh salan kopyayên hesabî biparêze. Di van deh salan de, çi dema ku nivîskar bixwaze, dikane hesabî kontrol bike.

BI AWAYEKÎ DIN WEŞANDINA BERHEMÊ

**Antolojî**

Ku weşanger ji berhama nivîskar beşekê di antolojî, kitêbên dersê an jî ansîklopedîyekê de bide çapkirin, divê bi nivîskar re bi awayekî li hev bike. Ku nivîskar bixwaze ji berhama xwe beşekê di antolojî, kitêbên dersê an jî ansîklopedîyekê de bide çapkirin, divê riza weşanger bigire.

TETBÎQKIRINA PEYMANA BINGEHÎN

**Dubendî**

Ku di tetbîqkirina peymanê de dubendîyek di navbera nivîskar û weşanger de derkeve, ji herdu alîyan yek dikane ji bo çareserîya dubendîyê, gilî û îtiraza xwe bibe komîsyona çareserîya dubendîyên vê peymana bingehîn.

**Destpêkirina peymanê**

Roja ku ev peymana bingehîn ji alîyê Komeleya Nivîskar û Komeleya Weşangeran ve hatiye girêdan û pê ve, hemû peymanên weşnaxaneyên endam girê dide.

**Betalkirina peymanê**

Heta ku herdu alî biryara betalkirinê nedin ev peyman li kar e. Alîyên hevbeş divê betalkirina peymanê bi kêmanî berîya şeş mehan diyar bikin.

Stockholm 00.00.00

Komeleya Weşangeran — Komeleya Nivîskaran

*Ev forma peymanê li gor prensîbên peymana bingehîn hatiye amadekirin ku ji alîyê Komeleya Nivîskar û Komeleya Weşangeran ve hatiye pejirandin. Ev form di navbera nivîskar û weşanxaneyê de girêbendek e û ji 02.08.07an pê ve tê bikarhanîn.*

## PEYMANA WEŞANXANEYÊ

☐ berhema edebî ji bo mezinan
☐ berhema faktayî
☐ berhema edebî ji bo zarok û ciwanan

Weşanger:
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
Nivîskar:
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
..........................................................................................................................................................
(Navnîşan û roja ji dayîkbûnê divê li rêzên jor bên nivisîn.)

Bi vê peymanê nivîskar destûra mafê weşandina kurdîya vê berhema xwe mîna kitêb dide weşanger. Kitêba ku bi navê: ....................................................................................
ê bi van şertên jêrîn were weşandin:

☐ Kitêb li gor prensîbên lihevkiri dibe
☐ Kitêba bi wêne / îlustrasyon

**Manuskrîpta ji bo çapê amade:**

☐ Manuskrîpt roja îmzekirina vê peymanê hatiye teslîmkirin
☐ Derengtirîn di roja 00.00.00 de tê teslîmkirin

**Materîyalên mayî (wêne, îlustrasyon û hwd)**

☐ Roja îmzekirina vê peymanê hatiye teslîmkirin
☐ Derengtirîn di roja 00.00.00 de tê teslîmkirin

Piştî teslîmkirina manuskrîptê berhem di navbera 18 mehan de weke çapa yekem ....... lib tên çapkirin.

Ji vê peymanê du nimûne hatine amadekirin û ji herdu alîyan her yekî nimûneyek wergirtîye.

Cîh:........................
Tarîx: ....................

Nivîskar:............................ Weşanxane:.............................

## PEYMANA BINGEHÎN JI BO WERGÊR

*Ev peyman ji bo wergêr û weşangeran, di navbera Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran de hatiye girêdan.*

PRENSÎBÊN GIŞTÎ

Ev peyman û prensîb ji bo wergêr û weşanger, di navbera Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran de hatine danîn. Peyman tenê ji bo wan berhemên ku di çarçove û çavdêrîya Komeleya Nivîskaran de ye. Ev peyman, ji bo berhemên edebî û faktayî ne ku weke pexşan hatine nivîsandin. Weke nimûne wergera helbestan ne di nav çarçoveya vê peymanê de ye. Wergera helbestê tiştekî xas e ku wergêr û weşanger divê di nav xwe de li ser li hev bikin.
Mebesta ji wergêr ew kes e ku ji alîyê Komeleya Nivîskaran ve mîna wergêr hatiye pejirandin.

**Forma peymana weşanxaneyê ji bo karê wergerandinê**
Ev forma peymanê divê li gor prensîbên peymana bingehîn be ku ji bo wergêr û weşanger di navbera Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran de hatiye girêdan. Forma peymana weşanxaneyê divê bi nivîskî be û îmzekirî li ba wergêr û weşanger hebe.

**Erka wergerandina berhemê**
Bi vê peymana weşanxaneyê, wergêr li ser hesabê weşanger xwe dide ber karê wergerandina berhemeke ji zimanekî bo zimanekî din.

**Mafê ku têne dewrkirin**
Bi vê peymana wergerandinê wergêr, mafê çap û zêdekirina berhema wergerandî dewrî weşanger dike. Hemû mafên mayî yên wergêr in.
Ev mafê weşanger heta demeke diyarkirî ye ku wî û wergêr li ser li hev kirine. Li hin welatan ev wext deh sal in.
Piştî ku ev dema diyarkirî xelas bibe, wergêr ji bo çapeke nû ya berhemê divê berê ji weşangerê xwe bipirse. Ku ew di navbera du mehan de bersivekê nede, wergêr dikane bi weşanxaneyeke din re peymaneke nû çêbike.

**Dewrkirin û dewrkirina mafê weşanê**
Weşanger bêyî destûra wergêr nikane mafê weşandina berhemê dewrî weşanxaneyeke din bike, an

jî bifroşe. Lê ku weşanger weşanxaneya xwe bifroşe, wê çaxê wergêr li vê weşanxaneya nû dibe xwedîyê eynî mafî. Dema ku weşanxane îflas bike, mafê weşanger li ser berhemê namîne.

## ERK Û BERPIRSÎYARÎYA WERGÊR

**Taybetmendîyên wergêr**

Wergêr li gor normên heyî xwe dide ber erka wergerandina berhemê ku bi awayekî têr û tekûz wergerîne.

Dema ku weşanxane lê hûr bibe û bibîne ku werger ji alîyê ziman, stîl û naverokê ve ne têr û tekûz be, divê wexteke din bide wergêr ku van kêmasîyan sererast bike. Ku dîsa jî wergera berhemê ne bi dilê weşanger be, mafê weşanger heye ku ew bi xwe van guherandinan bike. Lê divê wergêr ji van guherandinan were haydarkirin. Ku wergêr di navbera du hefteyan de bersivê nede, guherandinên weşanger di cîh de ne.

**Manuskrîpt**

Roja teslîmkirina manuskrîptê divê di peymana wergerandinê de were nivîsanadin.

Dema ku manuskrîpta wergêr tê teslîmkirin divê bêyî kêmûkurî amadeyî çapê be.

Ew wexta ku wergêr û weşanger di peymanê de li ser li hev kirine, divê wergêr manuskrîpta berhema xwe teslîmê weşanxaneyê bike.

Lê ku wergêr sersarîyê bike û di wexta diyarkirî de berhema xwe teslîm neke, divê weşanger 14 rojan berê wergêr haydar bike ku ew ê peymanê betal bike. Di rewşeke weha de ku weşanger peymanê betal neke, dikane heta ji sedî bîstê perê wergerê jê bikuje.

Piştî weşanê divê manuskrîpta wergêr tev hemû materîyalên xwe li wergêr vegere.

**Sererastkirin û lêhûrbûna berhemê**

Maf û berpirsîyarîya wergêr e ku piştî lêhûrbûnê careke din berhema xwe ya wergerandî bixwîne.

Ji bo vê yekê mafê wergêr tuneye ku daxwaza pereyekî bike.

Piştî sererastkirinê, ew guherînên ku wergêr bike û ji sedî dehê mesrefa mîzampajê zêdetir be, mesrefa çûyî wergêr dide.

## ŞERTÊN ABORÎ

Weşanxane divê ji çaran sê parên mafê wergerandina wergêr di dema teslîmkirina manuskrîptê de bide. Pîvaneke giştî ji bo pereyê wergêr tuneye.

Li hin welatan ev pere li gor wergerandina hejmara gotinan, li gor hejmara rûpelan an jî li gor tevayîya berhemê ye.

**Kitêbên ku ji bo wergêr weke diyarî tên dayîn**
Di çapa yekem de divê weşanger 15 kitêban weke diyarî bide wergêr. Di çapên mayîn de jî ev diyarî 10 lib in.

DI DERXISTINA BERHEMÊ DE BALEKE PÊWÎST

**Bi cîhkirina navê wergêr**
Di weşandin û zêdekirina berhemê de divê navê wergêr di rûpela hundur de hebe. Herwusa divê navê wergêr di katalog û reklamên berhemê de jî were nivîsandin. Ku ev berhema wergêr di weşanxaneyeke din de jî were weşandin, dîsa jî divê navê wergêr were nivîsandin.

**Dubendî**
Ku di tetbîqkirna peymanê de dubendîyek di navbera wergêr û weşanger de derkeve, ji herdu alîyan yek dikane ji bo çareserîya dubendîyê, gilî û îtiraza xwe bibe komîsyona çareserîya dubendîyên vê peymana bingehîn, peymana ku ji bo wergêr û weşanger di navbera Komeleya Nivîskar û Komeleya weşangeran de hatiye girêden.

Roja ku ev peymana bingehîn ji alîyê Komeleya Nivîskar û Komeleya Weşangeran ve hatiye girêdan û pê ve, hemû peymanên weşanxaneyên endam girê dide.

Heta ku herdu alî biryara betalkirinê nedin ev peyman li kar e. Alîyên hevbeş divê betalkirina peymanê bi kêmanî beriya sê mehan diyar bikin.

Ev peyman mîna du nimûneyan hatiye amadekirin û her yekî nimûneyek wergirtîye.

Stockholm 00.00.00

Komeleya Weşangeran — Komeleya Nivîskaran

*Ev forma peymanê li gor prensîbên peymana bingehîn hatiye amadekirin ku ji alîyê Komeleya Nivîskar û Komeleya Weşangeran ve hatiye pejirandin. Ev form di navbera wergêr û weşanxaneyê de girêbendek e û ji 00.00.00an pê ve tê bikarhanîn.*

**PEYMANA WEŞANXANEYÊ**

Ji bo karê wegerandinê ye

Ev peymana jêrîn di roja 00.00.00 de ji alîyê
wergêr: ........................................ û weşanxaneya: ........................................ de hatiye girêdan.

**Erk**

Weşanxane berhama jêrîn dide wergêr ku wergerîne kurdî:
Navê berhemê: ..........................................................................................................................
Nivîskarê/a wê ...........................................................................................................................
Wergêr li gor normên heyî xwe dide ber erka wergerandina berhemê ku bi awayekî têr û tekûz wergerîne.

**Mafê weşanxaneyê**

Mafê weşanxaneyê heye ku berhema wergerandî çap û zêde bike. Hemû mafên mayî yên wergêr in.

**Manuskrîpt**

Manuskrîpta wergerê bi awayekî tekûz û amade divê derengtirîn di roja ...00.00.00.... de were teslîmkirin.

**Lêhûrbûn**

Maf û berpirsîyarîya wergêr e ku piştî lêhûrbûnê careke din berhema xwe ya wergerandî bixwîne.

**Şertên aborî**

Weşanxane divê pereyên wergerandina wergêr di dema çapkirina berhemê de bide. Pîvaneke giştî ji bo pereyê wergêr tuneye. Li hin welatan ev pere li gor wergerandina hejmara gotinan, li gor hejmara rûpelan an jî li gor tevayîya berhemê ye.

**Kitêbên ku ji bo wergêr weke diyarî tên dayîn**

Di her çapeke berhemê de divê weşanger hejmareke kitêb belaş bide wergêr. Li hin welatan ji çapa yekem 15 lib tên dayîn û ji çapên mayîn jî 10. Ku wergêr ji bilî van zêdetir bixwaze, dikane ji xwe re bikire.

**Prensîbên din**

Prensîbên mayî jî li gor peymana bingehîn in, peymana ku di navbera Komeleya Nivîskaran û Komeleya Weşangeran de hatiye girêdan.

Ji vê peymanê du nimûne hatine amadekirin û ji herdu alîyan her yekî nimûneyek wergirtîye.

Cîh: ..................................................................................................................

Tarîx: ..................................................................................................................

Wergêr: ...........................................  Weşanxane: ...................................................

## PEYMANA BINGEHIN JI BO ÎLUSTRATOR

*Ev peyman ji bo îlustrator û weşangeran, di navbera Komeleya Îlustratoran û Komeleya Weşangeran de hatiye girêdan.*

PRENSÎBÊN GIŞTÎ

Ev peyman û prensîb ji bo îlustrator û weşangeran, di navbera Komeleya Îlustratoran û Komeleya Weşangeran de hatine danîn. Peyman ji bo wan hemû berhemên îlustrekiriyên edebî ye.

**Forma peymana weşanxaneyê**

Forma peymana weşanxaneyê divê li gor prensîbên peymana bingehîn be ku ji alîyê Komeleya Îlustratoran û Komeleya Weşangeran ve hatine girêdan. Forma peymana weşanxaneyê divê bi nivîskî be û îmzekirî li ba îlustrator û weşanger hebe.

**Mafê ku têne dewrkirin**

Bi vê peymana weşanxaneyê îlustrator, mafê çap û zêdekirina berhema îlustrekirî dewrî weşanger dike ku ew ji bo mezin û zarokan weke kitêb û kitêbok bi kurdî biweşîne. Hemû mafên mayî yên îlustrator in.

**Çap**

Mafê weşanxaneyê ye ku biryarê bide çend caran û çend liban çap bike.
Weşanxane divê beriya çapa yekem agahdarîyê bide îlustrator ku ka ew ê çend liban çap bike.

**Di peymana weşanxaneyê de çarçoveya wextê**

Wexta vê peymana weşanxaneyê heta ku weşana berhemê dom bike, li kar e. Lê ev wext piştî çapa dawîn zêdetirîn 5 sal e. Lê mafê wexta weşanê dikane bi peymaneke nu 5 salên din jî dirêjtir bibe. Piştî betalbûna peymana weşanxaneyê hemû mafên berhemê li îlustrator an jî li warisê wî/wê vedigere. Ku îlustrator bixwaze berhema xwe ji nû ve biweşîne, divê berê ji weşangerê xwe î berê pirs bike. Ku ew jî heta mehekê bersivê nede, mafê îlustrator heye ku berhema xwe li cîhekî din biweşîne.

**Dewrkirina mafê weşanê**

Weşanger bêyî destûra îlustrator nikane mafê weşandina berhemê dewrî weşanxaneyeke din bike, an jî bifroşe. Lê ku weşanger weşanxaneya xwe bifroşe, wê çaxê îlustrator li vê weşanxaneya nû

dibe xwedîyê eynî mafî.
Dema ku weşanxane îflas bike, mafê weşanger li ser berhemê namîne.

**Erk û berpirsîyarîyên îlustrator**

Weşanger û îlustrator di peymana weşanxaneyê de li ser wextekê li hev dikin ku îlustrator materîyalên xwe teslîmê weşanxaneyê bike. Lê ku îlustrator di wê wexta diyarkirî de materîyalên xwe neyîne, weşanger berîya betalkirina peymanê ji bo silametîya berhemê wexteke nû diyar dike. Di betalkirina peymanê de ew pereyên ku îlustrator wergirtîye, divê li weşanger vegerîne.

**Kalîteya çapa îlustrasyonê**

Ji bo ku reng, xet û nexşên îlustrasyonê weke orîjînal derkevin, çapeke bi rêkûpêk divê. Ku îlustrator bixwaze li ser vê yekê dîtin û gotinên xwe bibêje, divê di wextê de vê yekê bike. Heta ku îmkan hebe weşanger jî divê van daxwazan bi cîh bîne.

**Mafê bikarhanîna îlustrasyonê**

Ku peymaneke taybetî di navbera weşanger û îlustrator de tunebe, hertim orîjînalê îlustrasyonê yê îlustrator e. Dîsa ku peymaneke taybetî di navbera wan de tunebe, piştî xelasbûna wexta peymana weşanxaneyê hemû materîyal li îlustrator vedigere. Heta ku weşanger orîjînalên îlustrasyonê li îlustrator vegerîne, divê bi awayekî baş û tekûz biparêze.
Wexta ku orîjînalên îlustrasyonan zîrarê bibîne an jî wenda bibe, divê weşanger heqê wan bide.
Bêyî destûra îlustrator bi tu awayî îlustrasyonên wî nikanin werin raxistin, nîşandan an jî çapkirin.

**Mafê telîfê**

Pereyên telîfa îlustrasyonê carina li gor hesabê liban e, carina jî li gor hemû îlustrasyonên berhemekê ne. Pereyên telîfa îlustrasyona berga berhemekê bi serê xwe ye.
Dema ku îlustrator materîyalê xwe yê ji bo çapê teslîmê weşanger dike, divê pereyên telîfê bên dayîn.

**Kitêbên ku ji bo îlustrator weke diyarî tên dayîn**

Di çapa yekem de divê weşanger bi kêmanî 10 kitêban weke diyarî bide îlustrator. Di çapên mayîn de jî ev diyarî bi kêmanî 5 lib in. Ku îlustrator ji van zêdetir bixwaze, dikane ji xwe re bikire.

**Diyarkirin**

Di weşandin û zêdekirina berhemê de divê navê îlustrator di rûpela hundur de hebe.
Û herwusa di her libeke berhemê de tev navê îlustrator divê ev îşareta telîfê © (copyright) û sala çapê hebe ku xwedîyê berhemê were zanîn.

**Dubendî**

Ku di tetbîqkirina peymanê de dubendîyek di navbera îlustrator û weşanger de derkeve, ji herdu alîyan yek dikane ji bo çareserîya dubendîyê, gilî û îtiraza xwe bibe komîsyona çareserîya dubendîyên vê peymana bingehîn ku di navbera Komeleya Weşangeran û Komeleya Îlustratoran de hatiye girêdan.

**Wexta peymanê**

Roja ku ev peymana bingehîn ji alîyê Komeleya Weşangeran û Komeleya Îlustratoran ve hatiye girêdan û pê ve, hemû peymanên weşnaxaneyên endam girê dide.

Ev peyman di wexta xwe ya dîyarkirî de li kar e, lê ku herdu alî biryara betalkirinekê nedin, xwe bi xwe saleke din dirêj dibe.

Alîyên hevbeş divê betalkirina peymanê bi kêmanî berîya sê mehan diyar bikin.

Stockholm 00.00.00

Komeleya Weşangeran — Komeleya Îlustratoran

*Ev forma peymanê li gor prensîbên peymana bingehîn hatiye amadekirin ku ji alîyê Komeleya Îlustratoran û Komeleya Weşangeran ve hatiye pejirandin. Ev form di navbera îlustrator û weşanxaneyê de girêbendek e û ji 00.00.00an pê ve ji bo hemû berhemên îlustrekiriyên edebî tê bikarhanîn.*

## PEYMANA WEŞANXANEYÊ

**Weşanger** (nav, paşnav û navnîşana weşanxaneyê):
……………………………………
……………………………………
……………………………………

**Îlustrator** (nav, paşnav û navnîşan):
……………………………………
……………………………………
……………………………………

Bi vê peymanê îlustrator hemû mafên weşandina berhema xwe bi zimanê kurdî ji bo berhema bi navê:
……………………………………………………………………………………… dide weşanger.

**Orîjînalê îlustrasyonê ji bo çapê**

☐ orîjînalê îlustrasyonê roja îmzekirina vê peymanê hatiye teslîmkirin
☐ derengtirîn di roja 00.00.00 de tê teslîmkirin

**Li gor vê peymanê heta ku pêwîstî bi orîjînalê îlustrasyonê hebe:**

☐ li arşîva weşanxaneyê tê parastin
☐ îlustrator li ba xwe diparêze

**Mafê telîfa îlustrator li gor xala jêrîn hatiye dayîn**

- ☐ Li gor her bergekî berhemê …… panot / pere
- ☐ Li gor her îlustrasyonekê ……... panot / pere
- ☐ Li gor berg û hemû îlustrasyonên berhemê ….. panot / pere
- ☐ Awayekî din ……………..……………..………...........................................................................

………………………………………………………..........................................................................

.........................................................................................................................................

**Kitêbên ku ji bo îlustrator weke diyarî tên dayîn**

Di çapa yekem de îlustrator 10 û ji bo her çapên mayîn jî bi kêmanî 5 liban weke diyarî ji weşanxaneyê werdigire.

Ji vê peymanê du nimûne hatine amadekirin û ji herdu alîyan her yekî nimûneyek wergirtîye.

Cîh:..................................................................

Tarîx:..............................................................

Îlustrator: ....................... .......................          Weşanger: ......................... ..........................

# Çar kitêbên nû ji wêşanên APECê

## Kitêbek li ser bajarê şewitî: Lice




Amed Tîgrîs demeke dirêj bi kar û kedeke zêde ev pirtûka li ser bajarê xwe Liceyê amade kir. Pirtûka Liceyê bi dîroka xwe, bi serhildanên xwe, bi nifûsên sal û demên cuda cuda yek bi yek anuha li ber destê xwendevanan e.

Di pirtûka Lîceyê de ji kultura xelkê kurd heta jiyana kultura nav malê meriv rastî gelek mijarên balkêş tê. Ji gund û navên wan î kevn û kurdî, ji pez û rezên Liceyîyan heta şexsîyetên çê û neçê, meriv dibe xwedîyê zanebûneka berfireh. Ji bilî van hemû tiştan, başî û balkêşiya vê pirtûka Liceyê yek jî ew e ku pirtûk weke ferheng û ansîklopedîyeke navçeya Liceyê bi zar û zimanekî herêma Liceyê hatîye nivisandin.

Weke weşanxaneya Apecê em pê serbilind dibin ku em pirtûkeka bajar û navçeyekî Kurdistanê bi vê ked û xebata nivîskar û mamoste Amed Tîgrîs diweşînin.




***Gotinên Gunehkar***, Hesenê Metê

*Ji wê rojê û pê ve, ez rastî erdekî nehatim, rastî cîhekî nehatim, rastî wextekê nehatim ku bi qasî vê serpêhatiyê êş û kêfxweşîyek dabe min. Tev vê êş û kêfxweşîyê, mîna ku tiştekî dabe pey min û ez jê direvim, mîna ku min dabe pey tiştekî û lê digerim... a ji wê rojê û pê ve, ez di rewşeke welê de me. Lê ez nizanim bê çi ye, hîn jî pê nizanim: ne ew tiştê ku daye pey min û ez jê direvim, ne jî ew tiştê ku min daye dû û ez lê digerim... ez nizanim bê ev herdu tişt jî çi ne. Lê ez dizanim, roja ku ez bi van herdu tiştan bizanim, wê çaxê ez ê bibim şaîr, ez ê bibim şêt an jî pêxember... pêxemberekî bêyî ol, bêyî Xwedê. Ji ber ku anuha bi qasî ku ji Şeytên nefret dikim ez ji Xwedê jî nefret dikim, bi qasî ku ji Xwedê hez dikim ez ji Şeytên jî hez dikim.*




***Mextal***, Serkan Birûsk

*Kalekî çermsor tevî perîkên elokan di ber fîqa xwe ya qamûşî re ji kul û derdên xwe yên bêwarhiştinê re digirî. Pîrejinek efrîkî bi wê pîrîtiya xwe ya di temenê mirovahiyê de, bi rengrûyê xwe yê şevî, bi serê xwe yê dişibe deştên ziwa û rût ên li parzemîna xwe, ji her du çavên xwe yên bêrewa digirî û berzûrî jiyanê dibe.*

*Da ku cîhan giyana xwe ya kesk ji nava axa wê nekişîne.*

*Da ku çemên wê li goştên ajal û mirovên wê nebe çiravhestî.*

*Ji çolistana pîrê pir dûr, li dilê şaristaniya dinyanedîtî, zarokek sêwî, li ber sîha mendereyên ku ewrên ezman li newqa wan a qalind nayê hev, bi serê xwe yê ji madeyên hişbirinê mîna meşka bêrîvaneke mezopotamyîyê kil dibe, geh ji aşxaneyekê û geh jî, ji nexweşxaneyekê tê avêtin. Kolanên zarokan bi agirê bîdonên gemarê wêbêyan dişewitîne.*




***Antolojiya Çîrokên Zarokan,*** Zinarê Xamo

Meraqa tajî

.......

Wê şevê xew neket çavên wî, ji xwe ra digot, çawa ez tajî bim û nikanibim kwêrguyekî bi qasî lepekî bigrim?

Roja din tajî îcar bê xwediyê xwe, rabû bi tenê çû. Vir da geriya, wê da geriya, dawiya dawî rastî kwêrgî hat. Kwêrgî wek roja berê dîsa da çindikan û baz da. Tajî jî da ser piþtê, dîsa ha li vir, ha li wir, lê piþtî çend deqîqeyan tajî ew girt. Û jê ra got:

– Birakê kwêrgî, ez ji te mezintir û bezatir im, lê do min kir û nekir min nikanîbû tu bigirta, îcar îro min tu zû girtî. Tu dikanî ji min ra sebebê vê yekê bibêjî:

Kwêrgî got:

– Sebeb pirr hêsa ye. Ji ber ku do te ji bo xelkê, lê min ji bo xwe baz dida, lema jî te nikanîbû ez bigirtama. Lê îro tu ji bo xwe baz didî û lema jî ez ji ber te xelas nebûm, te ez zû girtim.

# ZIMAN Û ZAROKÊN ME HEBÛN Û PÎROZÎYÊN ME NE!




Ma meriv ê çawa zanibe xuşk li ku ye, ku ew hema hertim winda bibe? Ew dibêje, dunya hewqas mezin e ku gelek tiştên nû hene meriv bibîne, li aliyê dinê gir, girên nû, daristan û bajarên nû...

û ew hema ji nişka ve winda dibe! Lê belkî birayê biçûk dizane ka ew li ku ye, ew wê baştir dinase.

Û ku tu bixwazî, tu dikarî bi wê re biçî û bigerî, heremên ku ew xeyal dike, cîyên ku te tu caran neditîne.




Kê gotiye, ez bi kurdî nizanim!...

Zarokên delal û şîrîn, li vir binerin,
GOTINÊN MIN ÊN PÊŞÎN
ev in.
Ku hûn bixwazin û bizanin kîjan gotin,
GOTINÊN MIN ÊN PÊŞÎN in,
ji dê û bavê xwe re bibêjin,
bila evê pirtûkê ji we re bixwazin.